welat

Sal:3 Hejmar:107 6–12 Adar 1994 10.000TL (KDVD) Rojnameya Hefteyî

*Berpirsiyarê YJWK'ê Xanê:*

## 'Malbata Kurd li Ewrûpayê mîna berfê dihele'

Rûpel 12



*Di nava Meclîsa Neteweyî ya Komara Tirkiyeyê de*

# Demoklesî





Orhan Doğan ji aliyê polîsan ve bi kotekî li erebê hate siwarkirin.

**Hatîp Dîcle:** *"Pirsgirêk ji Qanûnê Bingehîn a Tirkiyeyê ya 1924'an dertê. Kurd qanûnê 1924'an wek dîroka neheqiyê dipejirînin. Ger dewlet siyaseta xwe ya şidetê bidomîne, çareseriyên demokratîk wê rojevê derkevin. Li gor qanûnekî fizîkê "Qanûna qabên yekbûyî" dema hûn aliyekî bidewsînin, aliyê din bilind dibe. Ger hûn kanala demokrasiyê vekin wê têkoşîn di wê kanalê de bimeşe. Na, hûn venekin wê kanala şîdetê bikeve dewrê. Ger em bên darizandin, wê helwesta me wek helwesta kalên me yên hatibûn îdamkirin be."*



Dûmahîk rûpel 8

# Siwarê Raşiyan Murad

Murad mirovekî ji eşîra Raşiyan e. Bav û kalên wî bi darê zor û zilmê, di sedsala 16'an de dema ku Celaliyan dest bi serhildana xwe kirin, hatin koçkirin Osmanî, ji wan tirsîn û gotin, “Heywax welatê me ji destê me derket.” Osmanî û eşîrên Ereban bûn yek, êrîşî ser eşîrên Kurdan ên herî mezin kirin. Kurd bi zorê ji Kurdistanê derxistin. Kurd li welatê biyanî bûn muhacir, rê li ber wan hate girtin. Gund bi gund, zozan bi zozan geriyan. Hinek ji birçînan, hinek ji nexweşiyan, hinek jî, ji sermayê şehîd ketin, me bi hezaran şehîd dan. Murad ne birîndarê me yî pêşîn e. Dewleta kedxwar tu rehetî neda wan, ku ew li cihekî bi cih bibin. Xwestina kedxwaran, wek tê zanîn, ew e ku wan di nav xwe de bihelînin û asîmîle bikin. Dema ku nikaribûn wan asîmîle bikin, vê carê jî, dewleta kedxwar malbat û eşîr ji hev diqetandin. Her malbatekê diavête cihekî.

Malbata Murad jî li der û dora Enqerê li gundê Mehîna bi cih kirin, welatê xerîbiyê bû welatê wan. Lê bav û kalên wî li welatê xerîbiyê li nav Tirk û tolan, ji Kurdayetiya xwe qet tu tişt winda nekirin, her tim serbilind bûn.

Murad nasnameya xwe ji bav û kalên xwe girt û di nav civata wan de mezin bû.

Murad û jina wî herdu jî ebûqat in. Berî avabûna Partiya Keda Gel (HEP) Murad endamê Partiya SHP'ê bû û demekî ew berendamê (aday aday) SHP'ê yê parlamentoya Tirk bû. Lê belê nehat hilbijartin. Gava ku Partiya Keda Gel (HEP) ava bû, Murad ew kirasê Sosyal demokrata bi qirêj, ji xwe xist, li ba heval û hogirê xwe cihê xwe girt. Pirr kes ecêb man, gotin Murad bi agir dileyize.

Murad tirs û xof ji ser xwe avêt, got; êdî bes e koletî, emê heta kengê bindest bin û heta kengê bêwelat binalin. Gava ku HEP hat girtin Murad bi hevalên xwe ve DEP ava kirin. Di nav DEP'ê de xebitî û karê sekreteriyê kir. Gava ku Yaşar Kaya hate girtinê, Serokatiya DEP'ê kir.

Dijmin ji Murad tirsî, nexwest ku ew bi pêş ve here, Murad bû kelem, di çavê dijmin re çû. Xewa dijmin revand. Dijmin tirsî, herêma Enedoliyê jî wek Kurdistanê bibe. Dijmin xwest wî ji holê rake, hat mala wî, jarjorek pê de berda, bi kêf ji malê veqetî. Dijmin bihîst ku ew nemiriye, hingê har bû. Gava ku min bihîst siwarê Raşiyan birîndar bûye, ez mat bûm, di cihê xwe de mam. Bezîm çûm malê, min got: “Eyşê te nebihîst Murad kuştine.” Got: “Xwedê neke çawa devê te lê digere.” Min got: “Xwedê kir çû.” Min rahiştê telefonê. Xwişka Seycan bersiv da min got: “Xwişkê ew çi ye, dîsa dijmin bi ser we de aniye?” Got: “Kek Hesen, xeman neke, Murad birîndar e, wî talûke derbas kiriye.”

***Hesenê Omerî***

# Tir li ku das li ku!

Gelî ronakbîr û rewşenbîrên Kurd û Kurdistanê di hejmara Welat a 104'an de dema min Nivîsara Welat xwend û qasî ez pê hesiyam hinek mirovên me yên xwe ronakbîr û bi Kurdî re eleqedar dibînin, dibêjin zimanê Welat herêmî ye. Ez wekî nezanekî şerpişk ên yekemîn li herêma xwe, beşadarî ramana wan nabim. Paşku (çimkî) li vê rewşa dijwar a mirin û nemayinê de ku, em îro lê dijîn yên ku gotina Arnold Doynbee nebiribe guhê xwe, ez wî ronakbîr napejirînim.

Mêze bikin Tûrkeş jî dibêje: “Zimanê Kurdî zimanekî herêmî ye.” Gelo pêştir (zêdetir) hûn bi çi tewrê li rojnameya Welat dinihêrin. Dema Welat derneketibû hûn li ku derê bûn? Û dema Welat derket şewqa wê li her çar parçê niştimana Kurdistanê da, hûn ji bo çi jê re ne bûn alîkar, ji zimanê herêmî bikin zimanekî Kurdistanî? Ramana we li ser kîjan partiyan be bila bibe, dema ji aliyên dijmin ve nexweşiyek bigihêje we, di cih de ew nexweşî bandor li ser rojnameya Welat û welatparêzên rojnameya Welat dike û we diparêze. Madem ji we nayê ku rojnameya Welat bixwînin tu rexneyên bêbinyad jî lê nekin.

Mînak: “Zilamek, payîzê çû çiyê, çilo birrînê ber bi êvarê derket ser serê zinarekî bilind û dasa xwe danî çeqekî dara, maziyê das jê negirt û ji destê wî felitî di zinar de çû xwar. Mêrik çû binê zinêr, lê geriya û nedît. Mexrebê hate mal, jina wî Xwedê qewet lê da û got te çikir? Mêrik jî pirr ji jina xwe ditirsiya got: “Welle hermet min pirr çilo kir, lê min dasa xwe winda kir.”

Jinikê jê re got: “Lawo, camêro bila canê te sax be, das çi ye?” Piştî salek pê ve çû, rojek jinik rabû li mal hevîr kir û di ber hevîrkirinê re piçek ba ji ber çû, 'yanî go pivv!” Kenê mêrik hat got: “Xwedê te nehêle!” Jinikê jî pirr şerm (fedî) kir û hêrs jî bû got: “Xwedê tenehêle ji bo çi te par dasa xwe winda kir.”

Mêrik jî got: “Ê hermet tir li ku das li ku...!!

Werin em bibin alîkar ji rojnameya **Welat** re; a me gişkan e û bikin sazî'ya saziya zimanê Kurdistanê. Dest ji herêmî, merêmiya berdin. Hûn çi dibêjin?

Bimînin di xweşiyê de.

***Nezanekî Gundî***



Ez di yeksaliya xwe de silavên xwe ji Stenbolê ji bo we zarokên Kurdistanê dişînim û dibêjim ezê jî di demeke pirr nêzîk de werim cem we. Min zehf bêriya we kiriye.

***Arjîn***

# Nivîsara Welat

## Metodeke nû

Dewleta Tirk bi mebesta rawestandina tevgerên pêşverû û domandina sîstema kedxwar, wek hemû dewletên kedxwar metodên dijmirovî û hovane ceribandine û diceribîne. Ji roja ku komara Tirk hatiye damezirandin ta îro, ji bo rê li ber girtina şiyarbûna çîn û gelên bindest, serdestên Komara Tirkiyeyê bêrawestin xebitîne û enerjiya xwe bi giranî di vî karê paşverû de xerc kirine. Ji bo vê jî, gelek metodên bi mirovan şaş dihêlin, ceribandine. Yeko yeko û dudo duddo kesên pêşverû hatine îdamkirin, kom bi kom gundî û karker hatine qetilkirin, di mitîng û xwepêşandanan de xwendekar, nivîskar û karker hatine gullebarandin, di serhildanan de bi hezaran bombe bi ser serê serhildêran de hatine avêtin, bi sedan gund hatine şewitandin, bi sed hezaran Kurd hatine koçberkirin, di zindanan de îşkenceyên nedîtî û nebihîstî hatine pêkanîn û bi sedan xortên ciwan hatine kuştin. Li ber çavên însanan zarok û jinên wan hatine qetilkirin û îxfalkirin.

Ev kirinên hovane giş bi metodên cihêreng hatine pêkanîn. Li gorî demê û rewşa siyasî metodên cihêreng hatine bikaranîn Ji xeynî van metodên hişk û hovane, car caran yên nerm lê sinsî (xasûk) jî, hatine ceribandin. Lê dem, çendehî û şeklê van metodan kengê, çi û çawa dibe bila bibe, reng û armanca gişan yek e. Zêdebûn û tundbûna van metodan girêdayê rewşa siyasî ye. Dijberî û pêşveçûna civakî çiqas zêde û tund bibe, li hember jî metodên dijwartir û hovanetir, an jî sinsîtir (xasûktir) tên bikaranîn.

***Bi vê metoda dawî, dixwaze hêviya gel bişkîne, dilê wan ji têkoşînê sar bike û çavê wan bitirsîne. Bi rastî ew jî dizanin ku ev jî ne çare ye û di vê metodê de jî bi ser nakeve, lê dîsa jî dibêje ka ez vê riyê jî biceribînim, hema belkî bi kêr hat. Mîna wî gundiyê ku li pey kerê xwe yê windabûyî bi çolê ketibû, lê piştî jê re xeber hatibû şandin ku kerê wî hatiye malê û dîsa jî wî dev ji lêgerîna kerê bernedaye û gotiye 'Ka ez li vê newala han jî binêrim, wekî ez nêzîkê newalê me'.***

Di van mehên dawî de, wek metoda nû dewletê ji hêzên sivîl bi giranî berê xwe daye ser kesên rewşenbîr, nivîskar, rojnamevan, sazûmankar û rêveberên sazî û rêxistinên Kurdî û proloter. Girtin û darizandina kesên wek serokê DEP'ê Yaşar Kaya, nivîskar Îsmaîl Beşikçî, Berpirsyarê Giştî yê Rojnameya Özgür Gündemê Gurbetelî Ersöz, nivîskar Fîkret Başkaya, Serokê Petrol-Îş'ê Münîr Ceylan, hin rayedarên DEP'ê û hwd. mînakên berbiçav in, ku dewletê berê xwe daye pêşeng û rêzanên çînên bindest. Lê bi vê yekê jî têr nebû, niha jî muafiyeta mebûsên Kurd hilda û ew jî girtin. Bi vê metoda dawî, dixwaze hêviya gel bişkîne, dilê wan ji têkoşînê sar bike û çavê wan bitirsîne. Bi rastî ew jî dizanin ku ev jî ne çare ye û di vê metodê de jî bi ser nakeve, lê dîsa jî dibêje ka ez vê riyê jî biceribînim, hema belkî bi kêr hat. Mîna wî gundiyê ku li pey kerê xwe yê windabûyî bi çolê ketibû, lê piştî jê re xeber hatibû şandin ku kerê wî hatiye malê û dîsa jî wî dev ji lêgerîna kerê bernedaye û gotiye 'Ka ez li vê newala han jî binêrim, wekî ez nêzîkê newalê me'.

Bi rastî rewşa dewleta Tirk pirr dişibe ya xwediyê kera windabûyî. Ew rind dibînin ku hêza bingeh a gelê Kurd têkoşîna çekdar e. Ji berê ve bêhejmar riyên hovane ceribandine li dij kesên sivîl, lê ji dijwarkirin û şiyartirkirina gelan pêştir bi kêrî tiştekî din nehatiye bes dîsa jî dibêje ku ez vê metoda din jî bi kar bînim. Ji ber vê yekê, bêguman girtina mebûsên Kurd jî, ji wan metodên çavtirsandinê ne. Gelo ev metod a dawî ye? Bêgunan na. Dibêjin di demokrasiyan de çare bêqedar(xaye) in. Di faişîzmê de jî metodên hovane bêqedar (xaye) in.

Ji ber vê yekê pêwist e em li hember metodê wê yên din jî xwe amade bikin û hêviya xwe ji serkeftina nîhayî nebirrin. Lewre têkoşîna gelê Kurd a ku her diçe bilindtir dibe, êdî ne gengaz e bi van metodên paşverû bê rawestandin, bi wî şertî ku mirov hêviya xwe winda neke û xebatên xwe bidomîne. Hingê êdî hema bila xwediyê kerê li newalên din jî binêre. Wê zehmetiya wî pê bimîne.

**Mazhar Günbat**

# PKK hilbijartinê boykot dike


**Navenda Nûçeyan–** Biryara PKK'ê ya boykotkirina hilbijartina 27'ê Adarê, ji aliyê Berdevkê Serokê PKK'ê Abdullah Öcalan Kanî Yilmaz ve, bi daxuyaniyekê hate îlankirin.

Kanî Yilmaz wiha got: "Em dizanin ku gelê me, di vê rewşê de ji bo dengdayînê naçe ser sandoqan, piştî biryara partiya me wê hîn bi disiplîn bilive, heke dîsa jî, ji sandoqan ray derkevin, hûn bizanibin ku, ev sandoq li garnîzonên leşkerî hatine danîn." Yilmaz got ku, "Hilbijartin pêvajoyeke demokratîk e, lê di rewşeke wiha de mirov nikare qala hilbijartineke azad bike."

Berdevkê Öcalan, Kanî Yilmaz biryara DEP'ê jî nirxand û got ku: "Ev biryar di cih de ye. Dewlet hemû kesên muxalif bi awayekî tund ceza dike." Di daxuyaniya Kanî Yilmaz de tê xwestin ku hemû berendam ji berendamiyê vekişin, yan jî wê ji aliyê PKK û ARGK'ê ve bên cezakirin.

Di dawiya daxuyaniyê de, Yilmaz dewlet vexwendî referandûmê kir.

Di vê mijarê de wiha got: "Heke cesareta dewletê heye, heke bi xwe ewle ye, bila hêzên xwe yên çekdarî vekişîne, bila li ber çavê dinyayê, di bin çavdêriya rêxistinên navneteweyî û nealîgir de, em referandûmekê çêbikin, fermo..."



*Kanî Yilmaz*

# ARGK'ê qetlîama Tanzê teşhîr kir

■ *Tanzê mehek berê dev ji cerdevaniyê berdabû û çekên xwe danîbûn. Piştî çekdanînê, Qereqola Cacasê gelek caran girtibû ser gund, tehde li wan kiribûn û bi şewitandina gund gef li wan xwaribûn. Di cerda dawî de jî, ji wan ji nû ve hildana çekan hatibû xwestin û dabûn diyarkirin ku nebine cerdevan wê gundê xwe terk bikin, an jî wê xaniyên wan bi ser wan de hilweşînin.*

**Navenda Nûçeyan–** Hêzên dewletê li gundê Tanzê, ku li ser Sasonê ye, qetlîamek çêkirin. Bûyer di 24'ê Reşemiyê de, roja pêçşemê qewimî. Gund, ji aliyê Qereqola Cacasê ve bi gulleyên topan ve hate jenandin û meleyê gund jî tê de 9 kes (yek jê zarok û yek jî pîrek) hatin kuştin, 12 kes jî hatin birîndarkirin, ku bi pirranî jin û zarok in. Ên birîndar dudo jê li Nexweşxaneya Dewletê ya Amedê û 10 kes jî li Nexweşxaneya Dewletê ya Batmanê tên dermankirin.

Piştî qetlîamê, hêzên leşkerî ew kesên ku ji bo kuştiyan gor dikolandin, dane ber gulebaranê. Hate daxuyandin ku, di pey bûyerê de gund ji hêla leşkeran ve hatiye dorpêçkirin, çiya û geliyên dora gund jî bi gulleyên topan ve tên kutan. Ev kirina wan jî wek ku hêzên dewletê bi gerîlayan re ketibe şer, hate nirxandin û mîna hewlên veşartinê hate şîrovekirin.

Bûyera gundê Tanzê ku ji aliyê hêzên Qereqola Cacasê ve hatibû kirin, di hemû rojname û medyaya Tirkiyeyê de jî hate behskirin ku hêzên ARGK'ê kirine.

Tanzê mehek berê dev ji cerdevaniyê berdabû û çekên xwe danîbûn. Piştî çekdanînê, Qereqola Cacasê gelek caran girtibû ser gund, tehde li wan kiribûn û bi şewitandina gund gef li wan xwaribûn. Di cerda dawî de jî, ji wan ji nû ve hildana çekan hatibû xwestin û dabûn diyarkirin ku nebine cerdevan wê gundê xwe terk bikin, an jî wê xaniyên wan bi ser wan de hilweşînin.

Gund ji 300 malî daketiye 55 malî, yên ku mane jî, ji ber xîzaniyê gundê xwe neterikandine. Gundiyan roja qewimîna bûyerê wiha anîn ziman: "Em ji bo ku nimêja terewihan bikin, çûbûn mizgeftê. Em li hêviya melê bûn. Me bala xwe dayê ku dengê sîlehan tê. Em pê hesiyan ku ji Qereqola Cacasê gulleyên topan bi ser gundê me ve diavêjin. Carekê me dît ku deng bi mele ket. Mele ji ber gulleya topê, ji piyên xwe ve birîndar bûbû.

Wexta ku gundî ber bi mele ve baz dan du gulleyên din jî bi ser wan de ketin. Gelek kes li erdê bêcan man. Di pey re sê hebên din jî bi ser gund de ketin. Piştî ku deng ji topan û sîlehan biriya, me kuştî û birîndaran hildan hundir. Gelek jê parçe wesle bûbûn, nedihatin naskirin."

Navê kesên ku hatine kuştin ev in: Sadik Aydin (Meleyê gund, 57 salî) Esad Çetîn (60), Kadir Dîlek (55), Vahdettîn Öngün (23), Hanîfî Yildiz (13), A.Rahîm Yildiz (23), Huseyîn Tekîn (16), Hanim Öngün (30) û keça wê ya sê salî Sohbet Öngün. Ên ku di bûyerê de birîndar bûne ev in: Yusuf Yildiz (55), Yusuf Çelîkbîlek (25), Naîme Çelîkbîlek (20), H.Ö (5), Hayriye Sayim (60), Arîf Yildiz M.A (3), A.A (5), Muhlîs Aydin (60), Azîz Öngün (21), Adîle Öngün (25), R.A (6) û Abdullah Akman (60).

**BERTEKIYÊN JI BÛYERÊ RE**

Qetlîama ku ji aliyê hêzên leşkerî ve hate kirin û ku di medyaya Tirkiyeyê de wek kirana PKK'ê hate nîşandan, gelek bertekiyê (reaksiyonê) kişand. Serokê Mazlum-DER'ê Îhsan Arslan bi nivîskî daxuyanî da û li hember kirinê derket. Mazlum-Der, komeleyeke hêzên îslamî ye û yên ku di qetlîama Tanzê de hatine kuştin û birîndarkirin, lêzimê (eqrebeyên) Serokê Giştî yê Mazlum-Der'ê Îhsan Aslan in. Aslan bertekiya xwe wiha di daxuyaniya xwe ya nivîskî de wiha derbir:

"Heke tola qetlîama Tuzlayê ji gelê gundê Tanzê bê hildan, wisa dixuye ku tu hêvî pêşeroja Tirkiyeyê nemaye."

Komandariya Qerergeha ARGK'ê ya Eyaleta Xerzanê bi belavokekê bûyerê protesto kir. Di belavokê de bal dikişînin ku qetlîamên bi vî awayî wê di rojên pêş de jî werine kirin û gazî li raya giştî ya dinyayê dikin ku qetlîama Tanzê protesto bikin. Di belavokê de wiha tê gotin:

"Em gazî li hemû mirovahiya dinyayê dikin, ku li hemberî qetlîamên Tirkiyeyê yên li Kurdistanê û bi taybetî jî ya Tanzê, ku di camiyê de pêk hatiye, şiyar bin û protesto bikin."

Ji aliyê din ve ragihandin, ku ew kesên di dawiya bûyera Tanzê de wek leşkerê kuştî hatiye nîşandan. Mehmet Neşe ye. Mehmet Neşe di 20'ê vê mehê de ji aliyê leşkeran ve, piştî cerda leşkeran ser gundê Şêx Hemza tê binçavkirin. Di vê cerdê de jî gund hatibû şewitandin û gundiyek jî hatibû kuştin.

Yekî bi navê xwe A.A ji rojnameya Gündemê re diyar kir ku, ew kesê wek leşkerê kuştî hatiye nîşandan Memet Neşe ye û di bin çav de ew dîtiye. Neşe jê re gotiye ku, "Wê min bikujin û biavêjine ser gundê Tanzê."

# HAWAR

**Dilbixwîn**

## Çîroka girtina Welat

Em ji Berlînê ber bi Bonnê ve diçûn. Hozan Pencewînî ku li kêleka (rex) min daniştibû (rûniştibû) çend name ji berîka xwe derxist berê xwe da min û got: "Bêhna welat ji van nameyan tê. Di van nameyan de ez Kurdistanê dibînim." Bi nava pênc nameyan (mektûban) bala wî bêhtir çû ser nameyekê. Name ji hêla berpirsiyarekî Welat ve, ji Hewlêrê hatibû hinartin (şandin).

Weke tê zanîn li başûrê Kurdistanê bi navê Welat, rojnameyek hefteyî bi Kurdî (Soranî–Kurmancî) û Erebî, der diçû. Di demajoyeke kin de, rojnameyê cihê xwe di rêza pêşemîn de girt. Bi dehan nivîskar, rojnamevan û rewşenbîrên Kurd xwe li dora wê kom kirin û ew bi berhem û nivîsarên xwe dewlemend kirin. Ji hêla naverok û rûpelbendiya xwe ve, rojname; ji weşanên partî, rêxistin û hikûmetê pêşvetir bû. Li Başûr vê berhemê ji yên din cudakir, berpirsiyariya mejiyekî nû, xêreke nû û afirandineke nû dikin. Lewma jî, yên ku kevin diparêzin û li hemberî pêşketinê derdikevin, li pêşiya nameyê bûne kelem.

Di nameya xwe de, nivîskar li ser çewtî û egerên (sedemê) girtina rojnameyê radiweste (disekine), bi şêweyekî wisa şîrove dike ku, mirov dikare bi hêsanî metodên PDK'ê yên polîsî bibîne.

***Herîrî:***
***– Divê hûn rojnameyê bigirin. Bi vî awayî em deranîna Welat napejirînin.***
***Sernûserê Welat:***
***– Çima? Sedem çi ne? Wisa be, "Xebatê" jî dadin.***
***Herîrî (bi xeyd):***
***– Ji niha û şûn ve, li vê derê deranîna Welat qedexe ye. Hûn li hemberê Tirkiyeyê dinivîsînin.***

Li jêr ez beşekî ji nameyê ji Soranî werdigerînim Kurdî–Kurmancî û ji xwendevanan re diweşînim: "Li Başûr fonksiyona hikûmetê nîn e. Însiyatîf di destên serokên partiyan de ye. Welat (rojname) girtin, qedexe kirin. Cesaret nekirin li hemberê 10 hejmarên me li ber xwe bidin. Ez dixwazim bi kurtî ji we re çîroka dadana (girtina) wê bînim zimên.

Endamê Komîteya Navendî yê PDK (KDP) Frenso Herîrî gazî sernûserê rojnameyê kir. Jê pirsî: "Hûn çawa dikarin rojnameyeke wiha rêkûpêk derînin û fînanse bikin? Evqas rewşenbîr û nivîskar bi çi armancê xwe li hawirdora we dicivînin? Kî alîkariya we dike? Hûn pereyan ji ku derê tînin. Sernûserê Welat dibersivîne: "Gelê Kurd, rewşenbîr û nivîskarên Welat, hem li hundir hem jî li derveyî Kurdistanê alîkariyê ji me re dişînin.

Herîrî:

– Divê hûn rojnameyê bigirin. Bi vî awayî em deranîna Welat napejirînin.

Sernûserê Welat:

– Çima? Sedem çi ne? Wisa be, "Xebatê" jî dadin.

Herîrî (bi xeyd):

– Ji niha û şûn ve, li vê derê deranîna Welat qedexe ye. Hûn li hemberî Tirkiyeyê dinivîsînin.

Sernûserê Welat:

– Dijmin e! însanên me dikuje, gundên me dişewitîne emê binivîsînin.

Herîrî:

– Di serê we de mejiyê PKK'ê heye.

Cîgirê Wezîrê (şalyarê) Çandî Barzan Melle Xalid, wiha dibêje ji Sernûserê Welat re:

– Divê hûn nexşeya (xerîte) Kurdistanê ji ser rojnameyê hilînin. Heke nexşe neyê hilanîn, emê neçar bin rojnameyê qedexe bikin. Emê nehêlin kesek ji we re binivîsîne. Gerek e, hûn siyaseta xwe biguherînin.

Berpirsiyarê PDK'ê sernûserê Welat tehdîd dike. Helwesteke dijwar li hemeberî distînê: "Yan hûnê bigirin, yan jî emê bi metodên xwe yên taybetî bidin girtin."

Abdulmûheyemen: Endamê Komîteya Navendî (PDK) Waliyê Hewlêrê, di 3.8.93'an de, tevî çend "peyayên" taybetî, diavêje ser navenda rojnameyê. Dest datîne ser hemû tiştên Welat, talan dike. Û bi fermî, bi zora "demokrasiya" Mele Barzanî rojnameya Welat qedexe dibe."

Weke tê zanîn gelek nivîskarên navdar yên weke Kemal Xembar, Reûf Hesen, Serfiraz Neqişbendî, Çalak û hwd. bi berhemên xwe her hefteyî li xwendevanan dibûne mêvan.

## Sînn Feîn Îrlandaya yekbûyî xwest

Konferansa Partiya Sînn Feîn'ê roja 26-27'ê Reşemiyê li Dublînê pêk hat. Ji konferansê ev dîtin derket: "Aştî bi helwesta hikûmeta Îngilîz ve girêdahî ye. Heta ew rê li ber pêkhatina yekîtiya Îrlandayê veneke, aştî nabe." Dîsa hate gotin ku, ji bo bakurê Îrlandayê guherînên bingehîn divê, ne hinek hewldanên bêwate û sazkirinên ku neyên pejirandin.
Rayedarên Sînn Feîn'ê xwestin ku, bêpêşdarazî û bêşert rê li ber beşdarîbûna wan a civînên aştiyê vebe, ji ber ku Sînn Feîn li bakurê Îrlandayê hêza çaremîn e û ev yek jî ji bo beşdariyê bes e. Rayedarên Sînn Feîn'ê xwest ku hikûmeta Îngilîz ÎRA'yê deyne aliyekî û wan vexwîne ser maseya aştiyê.

## NATO'yê 4 balefirên Sirpan xistin

Roja 28'ê Reşemiyê 4 balefirên Sirpan ên ku di ser Bosnayê re difirîn, ji aliyê du balefirên DYA'yê ve hatin xistin. Bi vê yekê jî NATO'yê xwest ku hêza xwe nîşanî Sirpan bide. Wek tê zanîn NATO'yê ji bo teslîmkirina çekên giran, dem dabû Sirpan, lê piştî derbasbûna vê dema ku hatibû dayîn, tu tişt nekiribûn. Bi vê yekê jî pêewlebûna dinê ya bi NATO'yê şikestibû. NATO'yê hêzekê giran li Îtalyayê û li keştiyên balefiran ya li Deryayê Adriyatîk ji bo Bosnayê amade kiriye. Ev hêz ji 170 balefiran pêk tê. Piştî vê bûyerê û hewldanên Rûsyayê, Sirpan daxuyand ku wê Balefirgeha Tûzlayê veke. Ev daxuyanî roja 1'ê Adarê ji aliyê Radovan Karadzîç ve hate kirin. Vebûna vê balefirgehê wê ji bo alîkariya însanî, bi kêrî misilmanan bê.

## Girtiyên Berxwedana Kewçêrê hatin efûkirin

Roja 24'ê Reşemiyê, serokê parlementoya berê Ruslan Xasbulatov û Cîgirê Yeltsîn Alexsander Rutskoî bi biryara Dumayê hatin berdan. Her çiqas Yeltsîn hewl da xwe ku rê li ber pêkhatina vê biryarê bigire jî, lê bi se neket. Yeltsîn bertekeke tund nîşan da. Berdevkê Yeltsîn Vyacheslav Vîllaîns got ku, endamên Duma yê pêbaweriya gel binpê kirine.
Li gorî nûçeya Ajansa Reuter'ê pêşî Xasbulatov hate berdan, girseyek gel bi alên sor çû pergînî (pêşiya) wî. Xasbulatov roja yekşemê daxuyand ku, ew dê ji polîtîkayê qut bibe û wek profesorekî aborînasiyê, dixwaze hinek gotarên xwe yên li ser aboriyê ji hev derxe û bi pirtûka ya ku berî bûyera Kewçêrê qedandî ve, deyne. Dîsa got ku îro tu polîtîkvanên ku mirov pê baweriya xwe bîne nîn in. Tê gotin ku wê Rutskoî ji bo serokkomariyê xwe wek berendam nîşan bide.

# Qetlîama El-Xelîlê îtîbara Arafat daxist




Çepgirên Îsraîlî li dij qetlîama El-Xelîlê xwepêşandanên protestoyê li dar xistin.



Baruah Goldstein

■ *Aştiya di navbera RRF'ê û Îsraîlê de bi kampanyayên mezin pêşkêşî raya giştî ya cîhanê bû. Pêkhatina vê peymanê wek serketina "Pergala Nû ya Dinyayê" hate binavkirin. Lê niha ev plana aştiyê jî wek "Pergala Nû ya Dinyayê" zû kete xetereyê.*

**Samî Berbang**

Qetlîama ku roja 25'ê Reşemiyê bi destê cihûyekî nîjadperest, li Mizgefta El-Xelîlê çêbû, derbeyeke mezin li têkiliyên di navbera RRF'ê û Îsraîlê de xist. Di vê bûyerê de 43 kes mirin, 150 kes jî birîndar bûn. Roja 25'ê Reşemiyê (înê) ku hem ji bo misilmanan, hem jî, ji bo cihûyan pîroz e, cihûyekî bi navê Baruah Goldstein berik reşandin ser mirovên di Mizgefta El-Xelîlê. Ev mizgeft di nava perestgeheke de ye ku ji bo file, misilman û cihûyan pîroz e.
Piştî pêkhatina vê bûyerê RRF'ê xwest ku, çekên di destê cihûyên li cihên dagirkirî de, bên berhevkirin û ji bo parastina Filîstîniya alîkariya naveneteweyî xwest. Îsraîlê ev yek nepejirand, li vê herêmê derketina derve qedexe kir, lê vê yekê rê li ber protestoyê Filîstîniyan negirt, di van bûyeran de jî zêdetir 20 kes ji aliyê leşkerên Îsraîlê ve hatin kuştin. Ev bûyer ji aliyê Îsraîliyên Çepgir ve jî hate protesto kirin.
Piştî vê bûyerê RRF'ê hemû lijneyên xwe yên ji bo guftûgoyên aştiyê vekişandin. Her çiqas Serokê DYA'yê Clînton; Arafat û Îzak Rabîn vexwendin Washîngtonê û xwest ku dîsa dest bi lihevrûniştinên ji bo ji holê rakirina nakokiyên di navbera herdu aliyan de bikin jî, ev tişt ji aliyê RRF'ê ve nehate pejirandin.
Îsraîl ji bo ku têkiliyên bi vê bûyerê zirar dîtî, ji nû ve baş bike, hinek gav avêtin, wek, zêdetir 500 girtiyên Filîstînî serbest berdan û çekên hinek nîştecihên cihû berhev kirin, lê van gavan têrî RRF'ê û gelê Filîstînî nekir. Rayedarên RRF'ê daxuyandin ku, ev gav, gavên şeklî ne, ev kesên ku hatine berdan, jixwe pirr hindik cezayê wan mabûye. Îsraîliyan jî gotin ku, wan girtiyên ji rêxistinên ku piştgiriya planê xweseriyê dikin û girtiyên ku xwîn nerijandine, berdane.
Li ser vê bûyerê, otorîteya Arafat ya li ser gelê Filîstînî jî kete xetereyê. Rêxistina El-Fetih ku, rêxistina herî mezin e û di bin serokatiya Arafat de dimeşe jî, li cihê dagirkirî belavokek belav kir û ji şervanên xwe xwest ku, her cure êrîşan li dijî dagirkeran pêk bînin. Wek tê zanîn vê rêxistinê piştî peymana aştiyê bi fermana Yaser Arafat şer rawestandibû. Bi vê belavokê û bi daxuyaniya rayedarên vê rêxistinê yên li Tunusê dawî li şerrawestinê ya ku piştî lihevkirina aştiyê pêkhatibû, hat. Tê gotin ku, rêxistina Îslamî Hamas piştî vê bûyerê di nav gelê Filîstînî de xurttir bûye.



**HELBESTEK JI FILÎSTÎNÊ**

Divê ez giyana xwe bikim destê xwe
Û bibim, biavêjim bira mirinê ya bêbinî,
Mirov divê an bijî jiyaneke ku dostan şa bike,
An jî berê xwe bide mirineke ku dijmin têk bibe.
Du rê hene li ber giyaneke payebilind,
Hembêzkirina mirinê, bêtirs,
Û pêkanîna armanceke berz.
Ma bêyî serbilindiyê jiyan çi ye?
Ew ne hêjayî jiyînê ye.
Ez dawiya xwe bi şêweyekî zelal dibînim
Dîsa ji bo ku bigihîjim wê şidandî û çak dilezînim

*Abdul Rahîm Mahmûd*
*Ji Îngilîzî werger: S. Berbang*

## Nasnameya Rêxistina Rizgariya Filîstînê (RRF)

RRF di sala 1964'an de hate avakirin. Di destpêka sala 1965'an de livbaziyên Futahê dest pê kir. Di 1968'an di civîna Meclîsa Neteweyî ya Filîstînê ya 4'an de hinek guherîn çêbûn, bernameyek hate pejirandin û baskê çekdarî, Artêşa Rizgariya Filîstînê (ARF) ava bû. Di komcivîna 13'mîn ya ku sala1974'an pêk hat de, hemû hêzên çekdarî hatin temsîlkirin û nûnerên hêzên serbixwe, nûnerên Eniya Neteweyî ya Filîstînê jî cih girtin.
Hêzên ku RRF'ê pêk tînin ev in:
1. Tevgera Rizgariya Neteweyî ya Filîstînê (Fatah): Di sala 1957'an de derket holê, serokê vê rêxistinê Arafat e.
Eniya Gelî ji bo Rizgariya Filîstînê: Di sala 1967'an de ji nav tevgera neteweyî ya Ereban derket. Serokê vê rêxistinê Dr. George Habaş.
Eniya Gelî ya Demokratîk ji bo Rizgariya Filîstînê: Di sala 1969'an de, ji EGRF'ê veqetiya. Serok: Nayif Hawatmeh e.
Eniya Rizgariya Ereb (ERE): Di sala 1969'an de ava bû. Serok: Abdel Rahîm Ahmed e.
Partiya Komunîst a Filîstînê: Di 1984'an de ava bû. Serokên vê partiyê, Talat Yakub û Mhd. Abbas in.
Eniya Gelî ya Têkoşînê (1976): Di bin serokatiya Dr. Samîr Ghoşeh de ye.
Pêşenga Gelî ji bo Şerê Rizgariyê (1968): Issam el Qadî
Eniya Gelî ji bo Rizgariya Filîstînê (Komandariya Giştî) 1968, Ahmed Cibrîl.

### 30 Parlementerên Sûriyeyê:

# 'Divê Tirkiye şerê qirkirinê rawestîne'

■ *Li hemberî kiryarên hovane yên Tirkiyeyê, 30 parlementerên parlementoya Sûriyeyê, deklarasyoneke protestokirinê îmzekirin û ji Süleyman Demîrel, Hüsamettîn Cîndoruk û Tansu Çîller re şandin. Deklarasyona protestokirinê bi destê Konsolosê Tirkiyeyê ji Şamê hate şandin.*

**Bonn, Welat–** Hikûmeta Tirkiyeyê, li hemberî gelê Kurd şerekî dijwar û zor bi rê ve dibe. Bi armanca qirkirinê bi hemû çekên xwe yên giran gund, çiya, bajar û kopanên Kurd dişewitîne. Însanên Kurd direvîne, dikuje û laşê wan bi tanqan ve girê dide, li hemberî van kiryarên hovane yên Tirkiyeyê, 30 parlementerên parlementoya Sûriyeyê, deklarasyoneke protestokirinê îmzekirin û ji Süleyman Demîrel, Hüsamettîn Cîndoruk û Tansu Çîller re şandin. Deklarasyona protestokirinê bi destê Konsolosê Tirkiyeyê ji Şamê hate şandin.

Di nameya xwe de parlementerên Sûriyeyê bêqeyd û bêşert rawestandina terora ku hikûmeta Çîllerê, li dijî Kurdan dimeşîne, daxwaz dikin. Di nameyê de hatiye şîrovekirin ku, hêzên taybetî yên dewleta Tirk şerekî ku qanûnan nas nake, dibine ser welatparêzên Kurdan. Nêrînên xwe bi vî awayî diyar dikin: "Ev biryareke reş e. Divê êdî hikûmet heqê gelê Kurd nas bike. Ji dema Osmaniyan ve ye ku, gelê Kurd bi destê karbidestên Tirk têne qirkirin. Ev şerê qirêj gerek e êdî bisekine."

Name wiha didome: "Şexsiyetên welatparêz ên Kurd, di berbanga rojê de bi destê polîs û jendirmeyên Tirk têne kuştin. Ev teror tu encamên baş peyda nake."

Name dide xuyakirin ku, şerê li hemberî Kurdan siyaseteke şovenîst dide pêş: "Êrîşên şovenîst ên hikûmeta Tirk yên leşkerî dewleta Tirkiyeyê jî dixe talûkeyê. Di dawiyê de weke ku xuya dike, wê dewlet zirarê bibîne, em parlementerên parlementoya Sûriyeyê, bi kuştina Kurdan tu caran ne razî ne, Em ji Tirkiyeyê rêzgirtin û hurmetgirtina gelê Kurd dixwazin."

Di nameyê de, parlementer çareserkirina pirsgirêka Kurdan wiha tînin ziman: "Bi diyalogê pirsa Kurdan tê çareserkirin. Teror pirsê hal nake."

Bi van hevokan dawî li nameyê tînin: "Em mafê Kurdan rewa dibînin. Êrîşên li ser vî gelê dîrokî protesto dikin."



## Ji Durre re girtina giyabî

Dadgeha Ewlekariya Dewletê ya Stenbolê (DED), der barê nivîsarê me Abdurrahman Durre de, biryara girtina wî ya giyabî da. DED–S'ê ji ber nivîsa Durre ya ku di 19.10.1993'yan de di rojnameya Özgür Gündemê de, bi navê "Serokê karên Diyanetê Birêz Nurî Yilmaz" derketibû, ev biryar da.

Ji ber ku nivîskar Abdurrahman Durre, roja 1.3.1994'an li dadgehê amade nebû, lijneya dadgehê der mafê wî de qerarê girtina giyabî da. Nivîskarê me Abdurrahman Durre niha li Ewrûpayê ye.

## Hasan Bîber: Neçin ser sandoqê

Serokê Giştî yê Sendîkaya Lîman–îş'ê Hasan Bîber, gazî li hemû hilbijêran kir ku neçin ser sandoqê û rayên xwe neavêjin. Serokê Lîman–îş'ê ku 8 hezar û 392 kes endamê wê hene, daxuyand ku tu sazî û qaydeyên demokrasiyê li Tirkiyeyê naxebitin.

Hasan Bîber, Serokê Giştî yê Lîman–îş'ê di 28'ê meha Reşemiyê de li Mêrsînê axivî û gazî kir ku, tu kes neçe ser sandoqê, ray neavêje û protesto bike. Bîber gote ku sermayedar dixwazin piştî 27'ê Adarê dest bi êrîşekê bikin. Bîber der barê vê yekê de wiha got: "Sermaye tedarekê êrîşeke giştî dike. Ango hikûmet rayeyekê fireh standiye. Piştî 27'ê Adarê wê gelê me bi êrîşeke gurr û tund ve rû bi rû bimîne. Lewre gelên me pê hesiyane ku tu cihêtî di nav partiyên sîstemê de nîn e."

# Dîcle jî dozdar e



*Tansu Çîller*



*Nahît Menteşe*



*Bülent Ecevît*



*Emîn Çölaşan*

**Navenda Nûçeyan–** Serokê Partiya Demokrasiyê Hatîp Dîcle, der heqê Serokwezîr Tansu Çîller, Wezîrê Karê Hundirîn Nahît Menteşe, Serokê Partiya Çepa Demokratîk (DSP) Bülent Ecevît û nivîskarê rojnameya Hürriyetê Emîn Çölaşan de doz vekir.

Hatîp Dîcle, li ser gotina Tansu Çîller û Nahît Menteşe ya ku der heqê wî de hatibû serfkirin, "xayinê welat" doza tazmînatê bi daxwaza 500 milyon pere vekir. Dîcle, der heqê Bülent Ecevît de jî doza tazmînatê bi daxwaza 100 milyon pere vekir. Wek tê zanîn ku Ecevît, li ser biryara DEP'ê ya vekişandina ji hilbijartinê diyar kiribû ku ev biryar, bi teblîxa Apo hatiye standin.

Ji hêla din ve Hatîp Dîcle, der heqê nivîskarê rojnameya Hürriyetê Emîn Çölaşan de jî doz vekir.

Dîcle sedema vê dozê jî wiha şîrove dike: "Çölaşan di nivîsê xwe de, navenda partiya me wek hedef nîşan dida. Li gorî Qanûnê Cezayê ya 311'an ev yek sûc e."

Li ser vê yekê ebûqatê Hatîp Dîcle Hasîp Kaplan, serlêdan li dadgehê kir û daxwaz kir ku ev kesên li ser Hatîp Dîcle peyivîne, li gorî qanûn heqaret kirine û pêwist e dadgeh van kesan ceza bike.

## A. Melîk Firat ji DYP'ê îstîfa kir



Pêşniyarnameya Mezarci, bû sebebê îstîfakirina du parlamenteran. Hasan Mezarci ji RP'ê û A. Melîk Firat jî, ji DYP'ê veqetiyan. Bi îstîfakirina Firat kursiyên DYP'ê dakete 179'an.

Neviyê Şêx Seîd û mebûsê Erziromê yê DYP'ê A.Melîk Firat ji partiya xwe îstîfa kir. Firat di roja 28'ê mehê de li parlamentoyê bi civîneke ji bo çapemeniyê ev biryar diyar kir. A.Melîk Firat daxuyand ku hem xwediyê pêşniyarnameyê û hem jî çapemenî meseleyê ji riya wê avêrê û berevajî kirine. Firat sebebê îstîfakirina xwe jî, ji kaxez xwend.

Parlamenterê DYP'ê A. Melîk Firat sebebê îmzekirina pêşniyarnameyê jî bi "ji bo pêkanîna lihevhatina milet û dewletê" ve girê da û diyar kir ku tê de heqaretek li dijî Atatürk tune bûyê. Firat wiha domand: "Ez li hemberî sûcdarkirinên siyasî û bi taybetî jî li yên îdamê me. Ez feyde di vekolandina biryarên îdamê yên ku berê hatine dayîn de dibînim. Heke neheqiyek di biyar de hebe vegerandina îtîbara kesên îdamkirî hewce dike. Min li ser vê prensîbê îmze avête binê pêşniyarnameyê.

Di metnê de tu heqaretek li dijî Atatürk nîn bû. Riya ku îro Tirkiye jî tengasiya ekonomîk û siyasî derkeve tenê bi avakirina pergaleke demokratîk û civakeke sivîl ve mimkûn e. Em tenê dikarin bi aştî û lihevhatinê xwe bigihîne vê yekê." Firat diyar kir ku îmzeya xwe jî, ji pêşniyarnameyê kişandiye.

Tê zanîn ku mebûsê RP'ê Hasan Mezarci, ji bo îadekirina îtîbara kesên ji ber "suîkasta Atatürk a İzmîrê ya di sala 1926'an de" pêşniyarnameyekê amade kiribû. Ji bilî mebûsên RP'ê yên DEP'ê yên BBP'ê û A. Melîk Firat jî îmze kiribû. Mezarci piştre daxuyandibû ku ew navê "Atatürk" napejirîne û ew kes weledê zinyayê ye. Li ser daxuyaniyên wî tevan îmzeya xwe ji pêşniyarnameyê kişandin. Hasan Mezarci û A. Melîk Firat jî, ji partiyên xwe veqetiyan.

## ARGK'ê avête ser Cizîrê

**Navenda Nûçeyan–** Roja 3'ê Adarê hêzên ARGK'ê avêtin ser Cizîrê û bi çekên giran û roketavêjan ve avahiyên fermî, bi taybetî avahiya qeymekam kutan. Hêzên dewletê jî lê vegerand, pozberiyê heta serê sibehê (seat 6'an) dom kir. Li gorî daxuyaniya fermî di vê êrîşê de 2 polîs mirin, yek jî birîndar bû, lê ev daxuyanî ji aliyê gel ve rast nehat dîtin. Li gorî agahiyên ku gel dan, hejmara miriyan zêdetir e û yek ji wan jî cerdevan e.

Piştî vekişîna gerîlayan, hêzên dewletê avêtin ser taxên Cizîrê û mirovên sivîl gullebaran kirin. Ji Taxa Dağkapiyê İsmaîl û Resûl Baliç yeksalî (İbrahim Sürmen) hate kuştin. Hêzên dewletê serê sibehê jî du kes (Abbas Zeyerek û lawê wî) ji erebeyê deranîn, gullebarankirin.

Ev bû hefteyek ku hêzên dewletê li vê herêmê operasyonên xwe didomînin, lê tiştek bi dest nexistine. Niha navçe di bin gemaroya hêzên deweletê de ne.

Çîrok

# Ava şîn û bayê felekê li welatê bextreşan

**Ebdulhelîm Yûsiv**

Xweşik bû. Pirr xweşik bû. Darek ji şînan, ji êşên kor, kuştiyê dîrokeke xiniz û tal bû. Dema bayê felekê li me rabû. Bû hevalê çiyan, berf dawerivî, bû lehî, pêl bilind bûn. Bîst û sê salan bilind bûn. Heta gihîştin bejna Fesîh.

Li gundekî dûr.

Li welatekî ji tozê.

Dayîkekê xwe bi ser pêçeka lawê xwe ve daqûl dikir, eniya biçûk maç dikir:

– Xwedê me biparêze haya me jê tune lawo.

Lawik nexweş bû, dikir axîn.

Kalekî destê xwe danî ser rûyê biçûk û bi ken gote dayîkê:

– Ev nalîna evîndaran e bavo!.. Lawikê te bi dil e diya Fesîh. Herdu keniyan.

Lê Xwedê zane kalo ne şaş bû. Eger kesekî guhê xwe danîbûya ser dilê biçûk, wê nas bikira ku teperepa vî dilikî ji bo Olçiya ye. Olçiya, qîza Behzad a ku piştî çend rojan ji çêbûna Fesîh ronî dîtiye. Ji wê demê ve, hezkirina Olçiya bû dînamît û ket sînga Fesîh. Ev nav "Olçiya" gotina siseyan bû ku Fesîh ezber kir piştî "yadê" û "bavo". Her mezin dibû ev hezkirin jî di dilê wî de mezintir dibû. Bi hev re diçûn ber berxik û mihan, Fesîh digotê:

– Berxika min ji ya te xurttir e.

Olçiya dixeyidî:

– A min xurttir e. Were emê şert bigirin.

Her yekî berxikek nêr dianî. Olçiya bi herdu qiloçan digirt û ji berxê Fesîh dûr dixist. Wî jî bi pesnan serî li berxik germ dikir. Dihejmartin bi hev re:

– Yek, dido, sisê...

Qerpînî ji qiloçan dihat. Hevdu didan ber poşan heta herdu berx sist dibûn. Ne Olçiya ji gotina xwe dadiket, ne Fesîh. Bi çavgirtinekê dilîstin, xwe vedişartin. Bi "itkê" dilîyistin, dibeziyan. Bi "Laga" jî dilîstin. Ji ber ku tim Olçiya li ber "goka vekirî" bû û "diya" wê bû –wek zarok dibêjin– carê Fesîh ji qazîvkarê xwe dida dest Olçiya û dibû "diya wî." Li nav zarokan barê wê sivik dikir. Pirr lê miqate (haldar) bû. Bi hev re diçûn nêçîra gambelekan. Li hevdu parve dikirin. Gambelekên reş û spî û çikçikan para Olçiya bûn. Û yên serşîn û başoke para Fesîh bûn. Bi dû re bi destê wê digirt û ew dibir ser avê:

– Ka em avjeniyê bikin.

Fesîh li aveke şîn û zelal dinihêrî û digot:

– Çi ava me xweşik e!.. Çi ev ava şîn xweşik e. Bi Xwedê canê mirov pê ve ye (dipekê)...

Wilo digot ji ber ku av ya bavê Olçiya bû. Birk tijî bû, ji bo avdana baxan. Motor jî tim şixulandîbû.

Herdu li ser qiraxa birkê bûn. Di avê de wêneyê rûyê Olçiya dît. Fesîh ji kêfa re dîn bû. Bi kulman av ji cihê ku rûyê Olçiyayê tê re xuya dibû, vedixwar. Bêyî ku wê pê bihesîne. Ta carekê Olçiya têgihîşt. Awirek dijwar da Fesîh û kenekî bi fedî da ser her çar lêvan.

Gerdûn li beravê wan komeke

Tilûr û pinpinîkên rengînî bû.

Nû Fesîh bîr bir. Nas kir ku ketiye koncala evîneke bêbinî. Her Olçiya didît, pê re gurmîn ji sîngê dihat û xwîna wî germ dibû. Rûyê wê jî dibû kulîlk:

– Merheba...

Olçiyayê destê xwe da Fesîh. Wî jî tiliyên nazik û spî û nerm guvaştin û kenî. Olçiyayê fedî kir, bi nazî digot:

– Bavê min li hêviya min e.

Fesîh rêçik tev lê girtin:

– Ez ji te hez dikim.

Bi gotina wî re lemê çolan şax dan. Dar bişkivîn, ber dan. Heta bi lawiran serê xwe berdan ber xwe. Baskê dilê Fesîh çêbûn. Firiya, nema daket jêr. Olçiya bi lez vegeriya mal. Di wê rojê de kesên xerîb –biyanî– hatin gund. Di çend rojan de bûn xwedî qad û mal. Destê xwe xistin paşila her malê. Dest bi kirrîna axa gund kirin. Yek ji wan zêrker bû. Zêrên wî bi deng bûn li bajêr, ji ber vê kef bi ser devê gelekan diket û dixwestin xwe nêzîkî wan bikin. Lê qet nediket bîra Fesîh ku zêr û gotinên hingivîn wê serê Olçiyayê berî her serî bifitilînin. Matmayî ma. Tevî ku bavê wê –Behzad– gundiyekî bi şev û rojan ji bo nanê kuflet li kar bû. Roja bavê wî kontak bû û çû dilovaniya Xwedê, bi bîra wî hat. Olçiya ket deriya windabûnê. Geh Fesîh dikir "pêxember", geh jî silav lê nedikir.

– Ezmanê sibatê. Geh baran e. Geh ro ye.

Geh jî ba tê.

Yara wî ev bû.

Dilkoçer bû.

Bîst sal di hezkirina Olçiyayê de çûn. Bîst lib ji tizbiyekî biçûk pengizîn û di dawa zanîngehê de bela wela bûn. Ji Olçiya dûr ket. Di Fakulta Toreya (lîteratura) Fransewî de bû xwendevan. Evîn jî di dil de şîn dibû, bêriya Olçiyayê dikir. Her ku mehek dima digot:

– Min bêriya gund kiriye.

Eger te li merema wî bipirsiya dikenî û digot:

– Min bêriya diya xwe kiriye.

Rast bû. Lê Olçiya dil ji binî ve hilweşandibû. Xweş zanîbû ku Olçiya keçeke gundî ye. Gund jî parçeyek ji laşê welêt e. Welat jî cihê bextreş, melûl û bindestan e. Lê gelo bextreşî dikare mirovên bi namûs çêke? Agirê evînê tevî li agirê azadiyê bû. Arama wî wêran bû. Çawa welatek seranser bibe sol ji lingekî bi qirêj re û tu kes nebêje çima?! Çawa xelkê me bi milyonan di bin darê şivanekî biyanî û devlok de, li hêviya pariyek nanê hişk, devê wan pûç dibin. Her wiha pirs ji pirsê diza. Ji zû ve gotina bindestiyê dihat gotin. Lê Fesîh her mezin dibû. Her dixwend, ewqasî şerm li ber çav firehtir, mezintir dibû. Carina bêhn lê teng dibû:

– Tifû... Li wilo bextî, li wilo dîrok.

Gotinên bavê wî dihatin bîra wî:

– Wey li min û li vî zemanê bênamûsan.

Çi zemanekî berevajî lo!..

Di vê demê de carina vedigeriya gund. Bi bêhna Olçiyayê re giha şîn dibû. Bi deh çavan lê digeriya, bi hezaran gotin û gazin di serê wî de kom bûbûn. Olçiyayê jî çavekî wê li wî bû. Çavê din li zêr û gotinên xelkê bû. Ewr li ezmanan reş bû, li hev geriya, bû tûpişk. Rojekê Olçiyayê digot:

– Her ku tu têyî gund baran tê... Çima?

Fesîh li du lêvên qurmizî dinihêrî û dikeniya:

– Ez baran im. Lê ka ku erd pê zanibe?!

Olçiya têgihîşt ku ew gazina jê dike. Lê vegerand:

– Erdê me serhişk e.. Ma sûcê kê ye?

Serê xwe hejand û dev lêva xwe ya jêr kir:

– Xwezîka min zanîba bê çi di wî dilî de ye.

– Xwedê zane.

– Giraniya te min dikuje lê...

– Yek ji Almanyayê min dixwaze. Yek ji Fransayê. Li wir dixwînin. Yek ji wan doktor e.

– Lawê zêrker.

– Ew yek ji wan e. Ezê li Almanya...

– Tu zanî...

– Çi?!

– Wê xwîn li ser rê birije eger tu...

– Çiii... Bi çi mafî bavo!..

Ji ezman perdeyeke reş ket nav wan. Fesîh zanîbû her dûrî wê dikeve, ewqasî gotinên xelkê di serê wê de cih digirin. Carina destê xwe jê dişûşt, lê dilê wî nedihat şûştin. Vegeriya zanîngehê. Civînên xortan. Keçên pozbilind. Nexweşiyên ahengî bi xurtî serî li wir hildidan. Mijûl, danûstandinên dûvdirêj û fireh lê tiştek nedihat guhertin. Ku gotina "welat" dibihîst, pêncî mirî–bi hev re– serî hildidan, şiyar dibûn û agir vêdixistin. Tim ji xwe dipirsî çawa wê hîn xwendinê bigihîne serî û hîn... û hîn. Arama wî nema li hêviya ketina bar ji ser pişta dil. Zor tenê kare zorê bide alî. Ne hêzeke mezin be tu mafên mezin bi cih nayên, digot:

– Ê ku mafê xwe dixwaze bi gotinên bêkar wek mirovên tê ku bifetise di avê de û dest û ling pûç bibin. Em ku fikî bûn bi van daxuyaniyan ne bi şer be em ji şer paqij nabin.

Ji diya xwe re got berî çûnê:

– Ez venagerim heta Kurdistan çênebe!..

Û çû.

Bi sedan çûçik. Teyr, tilûr di zikê ezman de difiriyan. Dengê baskên wan li ber guhê Fesîh dibû wek dengê tembûrê. Bi vê diltenikiyê têkiliya wî bi tivingê re dest pê kir. Êvarekê tivinga xwe sipart kevirekî mezin ji kevirên çiyê û pê re mijûl bû:

– Xweziya min bi dilê te!.. Xwezîka mirov ji hesin bûna.

Li xwe vegerand:

– Bi Xwedê... Birînên Kurdan karin hesin bihelînin. Ez bi vê tenê diêşim ku miletekî sax bûye boyaxkar û garson û rêncberê ber destên xelkê. Tiving hilgirt. Dewsa wê şil bû. Matmayî ma. Ev çi ye?!

Qey hêstrên tivingan jî hene. Ev çi av e, ji ku hat? Tu kesî nikarîbû bersiva van pirsan bida ji pêvî Xwedê. Dengê hevalê wî ew şiyar kir:

– Fesîh xwe amade bike da em herin.

Bi koma hevalên xwe re berî da ava şîn. Ketin riya dijwar û dirêj, nêzîkayî li avê kirin. Serê wan di nav mij û dûmanê de winda dibûn, ezman tarî bû. Peşkê hûrik bariyan Fesîh li kêleka ava şîn rûnişt û ramanên wî ew birin û anîn. Birka bavê Olçiyayê hat bîra wî. Wêneyê wê, lêvên sor, dema di avê de biçûk û mezin dibûn. Diya wî di avê de şîn dihat wek şitlekê. Vê ava zelal her tiştê tenik di jiyanê de anî ber çav. Yar, dê, zaroktî, bihara gund, azadî, xortaniya ziwa, çivîk û berf, gambelek, mirina bav, hêêêh. Hat ku bi rewşa xwe bikene dema herdu çavên wî şil bûn ji hêstrên sar. Li tivinga xwe û li rûyê avê dinihêrî. Baran xurt bû. Hevalên wî yek bi yek xwestin xwe li avê bixin û derbasî aliyê din bin. Lê ezmanê reş û qelişî zor da zîpik û bahoz û baranê. Xuşîn bi avê ket. Bû guje guja pêlan. Lehî rabû. Ji ber ku Fesîh pirr ji avê hez dikir û ji ber kêfa avê jî jê re hat. Avê rahişt laşê wî tev tivingê û ew ji xwe re bir. Laşê wî bû hevalê pêlan, pêlên dîn, pêlên bêserî, pêlên kesk, sor, pêlên zer. Laşê Fesîh ê li hevhatî bi pêlan re dûr bû, nêzîk bû, mezin bû, fireh bû, bilind bû, bilind bû, bilind bû. Gihîşt zikê ezman. Laşê Fesîh bû çiya.

Çiyayekî din li çiyayên Kurdistanê zêde bû.



**Neqtik**

*Qise bîgêje, bîbêje, bîwêje.*

***Xilikî Mistefa Paşa***

**KÊ ÇI PEKAND?**

**Meclîsê peywira xwe anî cih. Vêga êdî dor dora edaletê ye.**

*Tansu Çiller*
*Serokwezîra Tirkiyeyê*

# Behram Beg û Mustafa Kemal

Di der mafê Şerhildana Şêx Seîd û eşîrên Kurdan de, du hevpeyvînê min di rojnameya Welat de hatine weşandin. Navê eşîrên alîgirê serhildanê û eşîrên dijber derbas dibûn. Eşîrek ji yên dijber, eşîra Mala Sêrdîn Begê Hazroyî bû.



Lawê Cemîlê Seyda, Mele Evdil Qudus ji devê Behram Begê Mala Sêrdîn serpêhatiyek ji min re got. Ev serpêhatî, dîrok û rastîtiya Kurdistanê li berê çavan radixe.

Piştî Serhildana Şêx Seîd têk çû, qirkirin û koçberiyan dest pê kirin. Mustafa Kemal, kesek ji hevdu neşuşt. Negot: "Ev alîgirê min e." Yên kuştin kuştin, yên din hemû koçberî rojava kirin. Pêşî dest bi wan xayînên welêt ên kor û nezan kir. Dor hate Behram Begê Mala Sêrdîn. Radibe, karê xwe dike, berê xwe dide Enqereyê. Heftiyekê li dû Mustafa Kemal dikudîne. Dike nake hevdîtinekê pê re nake. Roja heştan qestî miqamê wî dike. Gelekî rû didane û soza hevdîtinê distîne. Roja din bi nizmîtiyeke mezin derdikeve ba Mustafa Kemal. Li devê derî disekine û destên xwe liser hev dike. Paqên wî dilerîzin. Mustafa Kemal li ser masekê rûniştiye. Pişta wî li derî ye. Tiştek dinivîse. Jixwe weke ku kesek neketiye hundir. Piştî neh deh deqîqeyan bi zirt dibêje: "Bêje kuro! Tu yî Behram? Daxwaza te çi ye?" Behram Beg stûyê xwe xwar dike û dibêje: "Paşayê min, di perçiqandina Şêx Seîd de me alîkariyeke mezin da dewleta xwe. Tiştên ku me kiriye nayê gotinê. Min xwe avêtiye tor û bextê te. Ez hêvî ji te dikim. Min û malbata min koçber neke." Mustafa Kemal serê xwe ji nivîsandina xwe jî ranake û bi dengekî sar û beridî wiha dibêje: "Here biqeşite! Ez di n... me diya kurê ku bi kêrî bavê xwe neyê."

Behram Beg û malbata wî jî koçber dibin. Rezîl û perîşan dibin. Dema ku efû tê, vedigere welêt, dibê welatparêzekî herî mezin.

Aqûbeta wî li ser xayîn, noker, xwefiroş, cerdevan û bêşerefên welêt be.

***Jîr Dilovan***

**Jûjî...** **Doğan Güzel**




## *Zewaca Tirkan li me heram be*

Ji ber şerê giran ê li Kurdistanê, gelê Kurd ber bi bajarên Tirkan ve koç dibin û roj bi roj gund û bajarên Kurdistanê vala dibin û Kurd li bajarên Tirkan bi cih dibin. Ev bûyerên han bi pîr û kalên Kurd ne xweş bû. Lewre nedixwestin ku dev ji xaka bav û kalan berdidin. Ji bo wan dev ji xaka bav û kalan wek mirinê bû û kalekî axîn kişand ji vê rewşê re û wiha got: " Weyla li me aqûbeta paşî...Xwezî ez bimirama û min ev roj nedîtana. Ev bûyerên han ji mirinê jî xerabtir in û derdê ser derdan jî zewaca xortên me ye. Jixwe ew e ku mala daye çortanê, ber topan û dê bide ber topan."

Bi van gotinên kalo gundî ecêpmayî dimînin û dipirsin: "Çima kalo, dîsa çi bû?"

– Lawino! Hûn diçin bajarên wan, bi wan re dizewicin, dibin Tirk. Ew ji we zarokan tînin, zarokên wan Kurdên wek Tirk û ew zarokên Tirkên Kurd sibehê dê bibin leşker û bi Kurdan re şer bikin. Em Kurd û ew Kurdên ji me, ma hesin ji hesin dixwe...Temîniya min li we be lawinooo! Hûn bi Tirkan re nezewicin!

– Baş e kalo. Em soz didin te "zewaca Tirkan" li me heram be.

Soz didin û xatir ji kalo dixwazin.

***Evdillayê Hezoyî***

## *Gerîla û zimanê Fileyan*

Bi bandora propagandaya dijmin, car caran mirov dikeve hinek rewşên komîk. Wek tê zanîn, dijmin tim ji bo gerîlayan dibêje: "Ev Ermenî ne, ne Kurd in, doza Ermenîtiyê dikin, PKK dixwaze tola Ermeniyan hilde."

Rojekê li maleke welatparêz, malbat giş li hev civiyane li vîdeoyê temaşe dikin, di vîdeoyê de kaseta cerda gerîlayan, ya li ser Qereqola Taşdelenê heye. Berî livbaziyê gerîla govendê digirin, jina malê di nav gerîlayan de birayê xwe dibîne, pirr kêfxweş dibe. Guhê xwe didê ku, ji stranan fêhm bike, lê ji ber ku, dengê TV'yê qels e û stranên distrin xwerû bi Kurdî û tê de peyvên ji literatura siyasî gelek in, tiştekî jê fêm nake û di ber xwe de, dibêje: "Binêr, birayê min jî hînî zimanê Fileyan bûye, mirov tiştekî jî fêm nake."

***Ciwan Bawermend***

## *Ayetên Şeytanî? Pirtûkeke gelek balkêş e*

Ev gotin aîdê şagirtekî Xûmeynî, Celal Guandiyeh e ku ew ji destpêka damezirandina rejîma Şîîtiyê ve, li Îranê wek mûxalîfê rejîmê tê naskirin.

Guandiyeh pirtûka "Ayetên Şeytanî" ku derdorên îslamî tevlîhev kiribû, wek pirtûkeke balkêş û hêja nirxandibû. Guandiyeh mîna meleyekî adil û durist tê naskirin.

Ji ber ku ji destpêkê ve mûxalîfê rejîma Îranê bû, ku îdama wî dihat xwestin, ji ber vê cezayê ji Îranê reviyaye. Guandiyeh, bi Salman Ruşdî re ne hemfikir e, lê bi navê Quran'ê û îslamiyetê li hember kuştina Ruşdî ye. Guandiyeh ji 100 rewşenbîrên îslamî ye ku îmza avêtine pirtûka bi navê "ji bo Ruşdî".

# Demoktêsî

## Di nava Meclîsa Neteweyî ya Komara Tirkiyeyê de

**Navenda Nûçeyan–** Parlementoya Tirk, muafiyeta 8 parlementeran hilda. Piştî biryara parlementoyê, polîsên sivîl li devê deriyê meclîsê Serokê Giştî yê DEP'ê Hatîp Dîcle û mebûsê DEP'ê Orhan Doğan hildan binçaviyê. Ev qewimîna hildana binçaviyê, gelek bertekî (reaksiyon) dît.


Meclîsa Tirk, roja 2'ê Adarê, ji bo darizandina parlementeran, muafiyeta şeş kesan dotira rojê jî ya du parlementeran hilda. Bi vê qerarê, riya daraziyê ya bi îdamê li ber Serokê Giştî yê DEP'ê Hatîp Dîcle, mebûsên DEP'ê Orhan Doğan, Ahmet Türk, Leyla Zana, Sirri Sakik, Selîm Sadak û mebûsê Şirnexê yê serbixwe Mahmut Alinak vebû. Mebûsê serbixwe yê Stenbolê (ku berê yê RP'ê bû) Hasan Mezarci jî wê ji ber heqaretkirina li Atatürk were darizandin.

Dîcle û Doğan piştî biryarê, dema ji meclîsê derketin derve, ji hêla polîsên girêdahî "antî–terorê" yên sivîl ve hatin girtin. Hildana wan a binçaviyê wek skandaleke hiqûqî hate nirxandin û bû sebebê gengeşiyan. Li ser hildana binçaviyê ya herdu mebûsan, ên din du roj ji meclîsê derneketin der. Di 4'ê mehê de ew bi xwe teslîm bûn.

Biryara hildana muafiyeta mebûsan, bi rayên DYP, ANAP, RP, DSP, MHP, BBP, MP û bi sê parlementerên CHP û yekî SHP'ê ve pêk hat. Lê di rûniştina Lijneya Giştî ya Meclîsê ya 3'yê Adarê de muafiyeta mebûsê Şirnexê Selîm Sadak bi rayên DYP û MHP'ê, ya Hasan Mezarci jî bi yên DYP, MHP, CHP, DSP, SHP û ANAP'ê hate hildan. Bi vê encamê meclîs 7 parlementerê Kurd sewqî DED'ê (DGM) kir. Sebebê hildana muafiyetê, bi hinceta ku mebûs li dijî yekîtiya welatê Tirk propaganda û "sûcê parvekariyê" kirine ve tê girêdan. Mebûsên DEP'ê li gorî xala 125'an a Qanûnê Bingehîn a Komara Tirkiyeyê, wê bi xwestina îdamê bêne darizandin.



Hatîp Dîcle


Ahmet Türk



Orhan Doğan


Sirri Sakik


Leyla Zana


Selîm Sadak


Mahmut Alinak


Hasan Mezarci

### BERTEKIYÊN LI SER REWŞÊ

Hildana muafiyeta mebûsên DEP'ê û binçavîkirina Hatîp Dîcle û Orhan Doğan, ji hêlên cihêreng bertekiyên (reaksiyonên) ji hev cihê stand. Binçavîkirina Dîcle û Doğan wek skandaleke hiqûqî hate nirxandin. Helwesta polîsan di nav meclîsa Tirk de jî bû sebebê qewimîna gengeşiyan. Dorpêçkirina meclîsê ji aliyê polîsan ve tevî ku di hundirê wê de bi awayekî pirr cih standin, ji hêla mebûs û hin rayedarên hikûmetê ve bertekiyek stand. Heta îstifakirina Mudurê Giştî yê Emniyetê Mehmet Ağar hate xwestin.

Li ser girtina Dîcle û Doğan, Serokê Lijneya Giştî yê Meclîsê Mustafa Kalemlî, bertekiya xwe wiha da der: "Heta ku di Rojnameya Resmî de neyê weşandin, qerar nayê cih." Mudurê Giştî yê Emniyetê Mehmet Ağar jî fikra xwe bi vî awayî derbir: "Di nîzamnameya hundirîn de hikmekî vekirî heye. Dema meclis qerar bide em dikarin hildin bin çav."

Ji aliyê din ve Wezîrê Karê Hundirîn Nahît Menteşe daxuyand ku girtina mebûsên DEP'ê ne bi biryara wî pêk hatiye. Mudurê Giştî yê Emniyetê Ağar jî gote ku qerar ji aliyê Serdozgerê DED'a (DGM) Enqerê Nusret Demîral ve bi nivîskî ji wan re hatiye ku mebûsan bigirin binçaviyê da ku dernekevin derveyî Tirkiyeyê.

Serokkomarê Tirkiyeyê Süleyman Demîrel li ser hildana muafiyetê, nêrîna xwe bi gotinên, "Ev karê meclîsê ye, Qanûnê Bingehîn vê rayeyê dide meclîsê" anîn zimên. Serokwezîr Tansu Çiller jî, "Meclîs karê ku ketiye ser milên wê pêk aniye. Ji niha pê ve êdî ev ne karê me ye. Darazî êdî li ser kar e" gote û helwesta xwe da nîşan.

Serokê Giştî yê SHP'ê û Cîgirê Serokwezîr Murat Karayalçin, li ser pirsa ku der barê hildana muafiyeta mebûsan de bû wiha got: "Encamê qerarê ku hatiye standinê, jixwe min texmîn dikir ku wê tiştekî wiha biqewime." Li ser girtina herdu mebûsan jî ku ka binçavîkirina wan hiqûqî ye an na, wiha axivî: "Ez vê yekê nizanim, lê pevçûna me li ser vê bû."

Li ser hildana muafbûnê, parlementerê SHP'ê yê Sêwazê Ziya Halîs axivî û gotinên wî bûn sebebê gengeşiyê di nav mebûsên DYP'ê de. DYP'yî gazin ji Halîs kirin çima ku di dema rayavêtinê de ji bo rakirina mûafbûnê ya der barê DEP'iyan de ray nedane. Û jê re gotin: "Ev çi şirîkatî ye." Halîs jî, ji bo şirîkatiyê, "Kesê ku ji wê lavahiyan dike heye? Wê kî kê ji şirîkatiyê biavêje", got.

### DI DEMA STANDINA QERAR DE KÊ ÇI GOT?

Serokê Giştî yê DEP'ê û Parlementerê Amedê Hatîp Dîcle: "Heke hûn rê li aştiyê bigirin, hûnê warê şidetê mezin bikin."

Parlementerê Şirnexê Orhan Doğan: "Qerar ji derveyî parlementoyê hate dayîn."

Ahmet Türk Parlementerê Mêrdînê: "Ezê dîsa bi hemdê gel werim vira."

Parlementerê Amedê Leyla Zana: "Kursî tu car ji me re vekirî nema."

Sirri Sakik, Mebûsê Mûşê: "Hûn bi vê mantiqê, bi vê ramanê nikarin zêdetir welêt îdare bikin."

Mahmut Alinak, Mebûsê Şirnexê yê Serbixwe: "Heke paşeyek bixwaze hûnê sêpiyekê jî li vir rast bikin."

### DEP SERÎ LI SAZIYÊN NAVNETEWEYÎ DIDE

Serokê Giştî yê DEP'ê û Mebûsê Wanê Remzî Kartal (ku piştî girtina Dîcle bû), daxuyand ku, wê netîceyê bibine saziyên navneteweyî û dev ji vê yekê bernadin. Mebûsê Semsûrê Mahmut Kiliç jî diyar kir ku, ev qerar di civîna dawî ya Lijneya Ewlekariya Neteweyî (MGK) de hatiye dayîn.

Ji aliyê din ve Danîelle Mîtterand, Serokê Weqfa Azadiyan a Fransayê û pîreka Serokkomarê Fransayê François Mîtterrand, li Leyla Zana geriya û jê re gote ku li meseleyê taqîb dikin û wê François Mîtterrad li Serokwezîrê Almanyayê Helmuth Kohl bigere. Mîtterrand her wisa daxuyand wê heyetekê jî bişînin Tirkiyeyê û diyar kir ku, Serokê Komîsyona Yekîtiya Ewrûpayê Jack Delors ji serokê 32 dewletan re name şandiye.

Mitterrand wiha got: "Em vê rewşa ku mebûsên ji aliyê gel ve hatine hilbijartin, lê rû bi rû mane, tesvîp nakin."

Li ser daxwaza stî Mîtterrand parlementera Partiya Sosyalîst Segolone Royal pê re hate Tirkiyeyê û çû DEP'vanan ziyaret kir.

Ji aliyê din ve rayedarên hikûmetên Ewrûpayê piştî standina qerarê meclîsa Tirk pê re helwestên xwe diyar kirin û nerazîbûna xwe ya ji rewşê dane der. Serokkomarê Fransayê François Mîtterrand ji Serokkomarê Tirkiyeyê Süleyman Demîrel re nameyê şand û endîşeyên xwe derbir. Parlementoyên Îtalya û Swîsreyê, Wezareta Swîsreyê ya Derveyî, Yekîtiya Parlementeran a Navneteweyî, Komîsyona Ewrûpayê û Medico International kirinên li DEP'vanan protesto kirin.

### HELWESTA ROJNAMEYAN

Rojnameyên burjûwaziyê, dotira rojê biryara meclîsê bi manşetê ji hev cihê, lê bi naveroka xwe ve wekhev, tevan di rûpela pêşîn de bi awayekî fireh derxistin manşetê. Di nav rojnameyan de manşeta Yenî Günaydin balkêş bû: "PKK ji meclîsê hate qewirandin." Manşetên hin rojnameyan jî ev bû.

Millîyet: "Tesfiyeya lezgînî"
Hürriyet: "Binçaviya bi lezgînî"
Aydinlik: "Dîcle û Doğan di bin çav de"
Tercüman: "Wê bi îdamê bêne mehkemekirin"
Cumhurîyet: "Ji mebûsên DEP'ê re binçavî"
Sabah: "Wê DEP'van bi îdamê bêne mehkemekirin"
Özgür Gündem: "Derbeya MGK û TBMM'ê".


*Mebûsa Partiya Sosyalîst a Fransayê Segolone Royal ji bo piştgiriyê DEP'van ziyaret kirin.*



*Kurd êdî di şûna navên Tirkî, Erebî û Farisî de yên Kurdî li zarokên xwe datînin.*

# Hêviyên pêşerojê zarok in

**S. Özcan**

*"Ji ber ku hawirdor şekil dide mirovan, gerek e em hawirdoran pirr paqij bigirin."*

**K. Marx**

Zarok kulîlk in, gerek e em wan neperçiqînin. Zarok, hêviyê pêşerojê ne, gerek e em wan baş bigihînin. Zarok garantiya domandina nîjad û gelan in, gerek e em wan li gor tore, çand, dîrok, ziman û nirx û berjewendiyên wan ên neteweyî û civakî bigihîjînin.

Gava zarok tê gerdûnê bêol û bêziman e. Zarok; ol, ziman, dîrok , çand, tore û hemû nirxên xwe yên civakî û neteweyî, ji civaka ku tê de dijî distîne. Şexsiyet, raman û xuyên xwe ji hawirdorê xwe distîne. Zarok navên xwe jî, ji zimanê civaka xwe distînin.

Mînak: Gava ku zarokên Almanan tên gerdunê, navê wan Hans, Helmut, Klaus û hwd. datînin. Îngilîz navên wek Corc, Robert, Antony û hwd. lê zarokên xwe dikin. Navê zarokên Yahûdiyan (Îbrî) Îzak, Şîmon, Hezrî, Mîşel û hwd. in.

Her çiqas Faris jî di bin tesîra misilmaniyê de mabin, jî, dîsa li ziman, dîrok û gelek nirxên xwe yên din karîne xwedî derkevin. Navên zarokên xwe, bi giştî nebe jî, li gor zimanê xwe datînin. Weke Hunkar, Avsun, Şehzade, Mujde û hwd. Navên zarokên Ereban jî Yaser, Muhammed, Zeluh, Eyşe, Fatme û hwd. in. Tirk navên zarokên xwe, Engîn, Yaşar, Yüksel, Sezen, Asena, Asli û hwd. datînin.

Lê çi mixabin, demek dirêj e zarokên gelê Kurd, weke gelek mafên xwe yên din ên xuristî û neteweyî, ji wî mafê xwe jî dûr man. Bi taybetî jî, piştî pêldana misilmaniyê, ji wan mafên xwe dûr ketin. Çawa tê zanîn misilmanî bi hêsanî neketiye Kurdistanê. Ew piştî ketina hezaran can, herikandina xwînê weke çeman û piştî gelek talan û hovîtiyan kete Kurdistanê. Çawa dixuye ku derketina olê jî, ji Kurdistanê wisa hêsan nabe. Lê ku piştî ola îslamê kete Kurdistanê ji hemûyan pirrtir tesîra xwe li Kurdan kir.

Jixwe bi gelemperî gerdûna misilmantiyê, ji gelê Ereb, Faris, Tirk û Kurd hatiye holê. Lê bandora xwe ya herî mezin a ne baş jî da Kurdan. Lewre, Ereban armanca xwe pêk anîn. Her tişt li gor ziman û daxwaziya wan diziviriya. Faris ji hêla neteweyî ve zêde di bin tesîra wê de neman. Çanda Tirkan ji ya Farisan zehftir kete bin bandora misilmaniyê. Ji ber ku wê demê zimanekî wan ê fermî (resmî) û dîrokeke wan a dûr û dirêj tunebû. Yek jî, ji her hêlê de valahiyeke mezin dijiya. Wê valahiyê jî, bi olê tije kirin û bi navê xencera olê, gelek civaka xistin bin destê xwe.

Mîna me gotibû ku ji gelê herêmê hemûyan pirrtir, gelê Kurd kete bin bandora misilmaniyê. Lewra welatekî wî yê serbixwe tune bû. Di dewsa ku zimanê xwe bi pêş bixe, yê Ereban hîn dibû. Di cihê dîroka xwe de, dîroka Ereban dixwend.

Hê jî êşa wê birînê derbas nebûbû, Peymana 1639'an a Qesr-î Şîrîn da ser. Bi xaka Kurdistanê re, dilê gelê Kurd jî, xiste du parçe. Hê ew birîn kew negirtibû, vêca Peymana Lozanê ya 1923'an da ser. Wek xaka Kurdistanê dilê gelê Kurd jî bû çar parçe. Bi bandora olî re kotekiya Pers, Ereb û Tirk jî dest pê kir. Ew tiştê ku bi bandora olê nedikarîn bikin, bi kotekî xwestin pêk bînin, da ku nirx û hêjahiyên gelê Kurd ên civakî û neteweyî yeko yeko ji holê rakin.

Li gelek hêlên Kurdistanê nûnerên olî; mela û şêxan digotin: "Lêxistina dahol û zirneyê di dîlanan de guneh e." Ji ber ku ew hacetên muzîka Kurdan bûn. Digotin stranên dengbêjî yên mêraniyê û lehengiyê guneh in, yên evînî xêr in. Digotin: "Ew navê ku di Quranê de tune be, ji bo zarokan ne baş e, daneynin." Ew tişt giş ji bo ku nirxên gelê Kurd ên civakî û neteweyî ji holê rabin dihatin kirin. Van tiştan di Kurdistanê de berhem jî dan. Berî her tiştî navê zarokên Kurdan, ewê ku bi salan Elî, Hesen, Xalit, Emîne, Fatme, û hwd. bûn, êdî bûn Mehtap, Ferzende, Fîgan, Îsfehan Faris, Suna, Sevîm, Aydin, Kurtuluş, Oya, û hwd.

Bêguman gelê Kurd yek ji van jî, bi daxwaziya xwe qebûl nekir. Ji bo dîrok, çand, ziman û nirxên xwe yê neteweyî biparêze û lê xwedî derkeve, gelek car serî hilda. Lê bedelê wî bi can, bi xwîn, bi nefî û bi talan da.

***Gava zarok tê gerdûnê bêol û bêziman e. Zarok; ol, ziman, dîrok, çand, tore û hemû nirxên xwe yên civakî û neteweyî, ji civaka ku tê de dijî distîne. Şexsiyet, raman û xuyên xwe ji hawirdorê xwe distîne. Zarok navên xwe jî, ji zimanê civaka xwe distînin.***

***Wê bidome***

# Pilindira Pîr Rustem kanekê di nexşê çîrokan de digire

**Fener Rojbiyanî**




Xwendekarê Zankoya Helebê Pîr Rustem, xebata xwe ya li ser çîroka Kurdî berdewam dike. Di berehiyê de, **"Çivîkên Beravêtî"** û niha jî çîroknivîsê sozdar pirtûkek nû xiste gewrebana çîrokî. Ev pirtûka nû wek berdewamek e ji pirtûka wî ya berê, ji ber ku çîroknivîs di herdu berhemên xwe de jî li pey rêbazê sureal îzmê çûya. Nemeza di çîroka wî ya bi navê **"Koçeriya laşekî"** de, dîsan di çîroka **"Xwarina dawî"** de li pey rêbaza realîzma nû diçe.

Çîroknivîs di berhemên xwe de avahiyên çîrokan bi şêwazeke nûxwazî ava dike. Ev avahî yê ku çîrok ji gelek kîtên biçûk pêk tê û ev şêwazê hanê, xwe di çîrokên mîna "Sal" û "Zimanek Ziwa" de diyar dike.

Pîr Rustem di hundirê rêbaza realîzmê de, gelek pirsgirêkên civakî çareser dike û çîrokan xwe nêzîkî xem û derd û gelên çînên jêrîn ya civaka Kurdî û ji xwendevanan re rewşa rojane û derdkêşê mirovê Kurd bi şêweyeke hunerî dişîne. Xasma di çîroka **"Xwarina dawî"** de, dîsa çîroknivîs di hemû rêbazan de li ser pirsgirêkên sincî û perwerdî radıweste û ji xwendevanan re dide xuyakirin ku civak îroj bi başî û nebaşî, çi hikar li ser mirovê Kurd hiştiye û ezeziya miraran di civakê giştî de gihaye kîjan radeyî û bi taybetî jî di çîroka bi navê **"Senem"** de.

Pîr, di vê çîrokê de û bi riya wêneyekî civakî û dil bi êş, ji xwendevanan re kifş dike, ka ew ked û cef û jan yê ku qehremanê vê çîrokê dayîkeke bi navê "Senem", ya ku gelek azar û êş dîtiye ta ku karibiya zarokên xwe bi ser lingan bixe û pişt re bi firê dixe, lê mixabin zavayên wê, nirxa vî ked û cefayê nizanin. Pîr Rustem mînakek e sincî nîşanî pîrê dide dema ku malbat Senemê diçin mala kurê wan yê mezin Huso, ji serdanekê û li wir raste xwarinê tên. Lê cihê daxê, bûka malê mirûze xwe tirş dike. Parî di gewriya wan de ziwa bûbû, bû ziqûm. Gulê ji ser sifrê baz da, çû paşiya xênî û dengê giriyê wê bilind bû. Xemgîn, nizane xwe têke ku derê, ne kare berdewama xwarinê bin û ne jî rabe, wilo di cihê xwe de di tevize.

– Çawa dixwazî alî te bikim. Tu nabînî sibê zû ji mal radibin heya êvarê venagerim. Huso got.

Jina Huso bersivê dide:

– Ez jî nikarim xizmeta malbatê tevî bikim. Ez nikarim xizmet bikim û xeynî min bixwin.

Kêr gihîşte hestî, Xemgîn rabû ser xwe, xwest ji mala apê xwe... ji gund... cîhanê... bireve. Ji çermê xwe derê, lê diya pîr hate bîra wî, ewê di destê kê de bihêle.

Ev mînakeke sincî ya biçûk ji civakê ye. Xwedê mirov ji mînakên mezin bixefrîne.

Ji pirtûka nû tê xuyan ku, Pîr Rustem ji layê avakenê teşeyî û avahiyê çîrokan ve xurt e, lê ji layê zimanê Kurdî yê ku di çîrokên xwe de bi kar tîne qels û gelek çewtiyên çapê di pirtûkê de hene. Hêviya me ev e ku, Pîr Rustem bala xwe bide van babetan û çareser bike. Ta ku me ji cîhanê re çîrokeke Kurdî herî geş pêşkêş kiriye. Pirtûk ji 11 çîrokan pêk hatiye û ji weşanên kovara Asa li Kurdistan–Sûrî derçûye. Wêneyên berga pêşîn û ya paşîn ji firçeya nîgarkêş Nîhad Gulê ye.

*Li ser pirsa jin û malbatên Kurd hevpeyvînek bi Berpirsiyara YJWK'ê Xanê re:*

# 'Malbata Kurd li Ewrûpayê mîna berfê dihele'


*Ji bo rakirina malbata Kurd û avakirina malbateke hemdem û bi taybetî li Ewrûpayê hûn çi dihizirin?*

– Bi rastî, malbat bingeha civatê ye. Civat bi xwe ji malbatan tê pê. Komkirina malbatan civatê saz dike. Ev jî pêwistî û giringiyê dide malbatê. Têkiliyên malbatê jî, ji nêzîk ve bi pirsa jinê ve girêdayî ye. Mîna ku em dizanin malbata Kurd gelekî li paş maye, gihîştiye radeya ku em bibêjin her malbateke me bûye eniyeke dijmin. Çiqasî hizrên paşverû ku ji dijmin dertên, di nava malbata Kurd de peyde dibin. Bêhtir jî di nava malbatê de mêr nesîbê xwe ji vê girtiye. Ji kedxwar û hêzên serdest mêr hîkariyeke mezin dîtiye. Mîna ku her tim serokê neteweyî dibêje: "Bê çiqasî jin ketiye, ewqasî jî mêr ketiye." Jin û mêr herdu ketine. Di hêla têkilî û nêzîkbûnê de gelek neduristî hene. Helbet, armanca me ew e ku em vê malbata ketî ji xizmeta dijmin derxin. Bi taybetî li Ewrûpayê, malbata Kurd ketiye bin hîkariya hizra dijmin û bi awayekî ne raste rast dikeve xizmeta wî. Ji hêla din ve, ev malbat ber bi helandineke lezgîn ve diçin. Ev jî dibe sedema parçebûn û belavbûna civata Kurd û bi awayekî ne baş guherîna civata Kurdistanê. Em jî li gorî karînên xwe li hember vî tiştî têdikoşin. Ji bo ku civata Kurd belav nebe û li ser koka xwe û li ser tore û çanda xwe bimîne. YJWK têdikoşe. Armanca têkoşîna me ya herî bilind jî avakirina kesayetiyeke (şexsiyeteke) nûjen e. Em nûkirina malbatê bi nûkirina şexsiyetê re dibînin. Li hember şexsiyeta ku dijmin ava kiriye, em dixwazin şexsiyeteke Kurdistanî nû ava bikin. Bi avakirina vê şexsiyetê bi giyan û hizrên nû malbata nû tê avakirin. Em dikarin vê şexsiyetê bi şexsiyeta "welatparêz" bi nav bikin. Şexsiyeta Kurd ya welatparêz girêdayî ax, welat û gelê xwe ye. Girêdayî tore, orf, adet û çanda xwe ye. Ji bo Ewrûpayê jî ev wiha ye, eger em nexwazin malbatên Kurd belav bibin pêwist e em welatparêziyê di nav xwe de belav bikin. Em malbatê bi welat ve girê bidin. Niha YJWK dixwaze li gorî pîvanên rizgarî bike û ji hizrên dijmin azad bike, ji hêla din ve jî bi temamî bi civata Kurdistanî ve girê bide û bike xizmeta serxwebûn û azadiyê.

*Têkiliyên jin û mêrên Kurd hûn çawa dinirxînin û dixwazin bigihînin ku derê?*

– Têkiliyên jin û mêrên Kurd gelekî xerab in. Mirov dikare bibêje ev têkilî mîna têkiliyên di navbera gelê Kurdistan û kedxwaran de ne. Bê çiqasî têkiliyên gelê Kurd û kedxwaran ne wekhev in, di şekil û cewher de mirov wê ne wekheviyê di navbera jin û mêran de dibîne. Mêrê Kurd gelekî hişk e, xwe serbest dibîne. Dibêje her tişt ez im. Bêyî min tişt nabe. Kedxwar jî xwe li ser serê gelê Kurd bi vî awayî dibîne. Çarenûsa gel di dest wî de ye. Çarenûsa jinê jî di destê mêr de ye. Mêrê Kurd barekî giran e li ser pişta jina Kurd. Helbet, ev tişt roj bi roj di nav welatparêzên Kurd de tê guherîn. Bi gelemperî mêrê Kurd dûrî nermayî û hizrên demokratî ketiye. Wilo hatiye têgihîştin ku çiqasî mêr hişk be, ewqasî mêrekî jêhatî ye. Çiqasî bikaribe zorê li jinê bike, ewqasî mêr e. Bi vî hizrî mêrê Kurd dibêje: "Ez mêr im û ji min mezintir nîn e. Jina Kurd jî ketiye. Çiqasî mêr xwe bilind û serdest dibîne, jin jî xwe ketî û kêm dibîne. Bi vî awayî valahiyeke mezin di nav têkiliyên jin û mêran de heye. Yek ewqasî li jor, yê din jî ewqasî li jêr e. Çiqasî dijmin zor û kotekiyê li mêrê Kurd dike, ew jî ewqasî li jina xwe dike. Li ber dijmin dest hilnade. Lê li hember jinê qehreman e.

*Armanca têkoşîna me ya herî bilind jî avakirina kesayetiyeke nûjen e. Em nûkirina malbatê bi nûkirina şexsiyetê re dibînin. Li hember şexsiyeta ku dijmin ava kiriye, em dixwazin şexsiyeteke Kurdistanî nû ava bikin. Bi avakirina vê şexsiyetê bi giyan û hizrên nû malbata nû tê avakirin. Em dikarin vê şexsiyetê bi şexsiyeta "welatparêz" bi nav bikin.*



Jin ji civakê dûr ketiye. Xwe tiştek nahesibîne. Dema tiştekî dike jî şaşî û kêmasiyan dike. Eger em bixwazin hîn van têkiliyan vekin, jiyaneke reş tê ber çavan. Ev jî li hember şoreşê kelemên mezin çêdikin. Barê "YJWK"ê girantir dikin. Mêrê Kurd ji azadiya jinê ditirse. Ev jî ne rast e, ji ber ku jin hevala mêr a jiyanê ye. Çiqasî jin azad bibe, ewqasî hêz û quwetê dide mêr. Bi sedema van têkiliyên ne rast gelek hevberdan çêdibin. Malbat belav dibin.

Li Ewrûpayê têkiliyên jin û mêrên Kurd hîn xerab û kambaxtir in. Ji bilî hîkariya axatî, eşîretî û dîn li ser malbatên Kurd hîkariya kapîtalîzm û împeryalîzmê giran dibe. Li Ewrûpayê hevberdana jin û mêran gelekî erzan bûye. Ev jî xerabkirina civaka Kurd e. Mêr dibêje, "ez". Jin jî bi awayekî sexte azadiya xwe nas kiriye, dibêje: "Ez azad im, ez çi bikim ezê bi serê xwe bikim." Ji bo vê em dibînin malbata Kurd li Ewrûpayê mîna gulokek berf dihele û ber bi tunebûnê ve diçe. Ev jî, ji tesîra çanda împeryalîzmê tê. Mirovahî pirr erzan kiriye. Têkiliyên mirovahî û civatî mirandine. Ezezî heta bi dawiyê bilind kiriye. Ji bo tiştekî pirr biçûk jin dikare mêr berde û mêr dikare jinê berde.

*"Jina Serbilind", weşana YJWK'ê ye. Xwedîlêderketin ji hêla jinan ve û bi taybetî jinên xwendevanan ve çawa ye?*

– Ji bo jinên Kurd "Jina Serbilind" berhemeke pirr giranbiha ye. Riya wê ronahî dike. Di destê wê de çekeke bi hêz û xurt e. Lê mixabin giranbihayiya wê hîn nehatiye naskirin. Bi têrahî xwedîlêderketin çênebûye. Li hêla din jî, ji bo ku ev weşan jiyana xwe berdewam bike tu zehmetî nîn in. Şoreşa Kurdistanê wê bi xwedî dike. Kêmasî di hêla nivîsaran de heye. Ev jî kêmasiya jinên xwendevan e. Berhemên ku jinên Kurdistanê di nava şoreşê de diafirînin nimûneyên wan di cîhanê de kêm in. Lê bi temamî nayên nivîsandin. Pirr mijar hene pêwist e li ser bê nivîsandin, lê jinên xwendevan di vê der barê de bi rola xwe ranebûne û bi têrahî li weşana xwe "Jina Serbilind" xwedî derneketine.

*Şoreşa Kurdistanê; ji bo jina Kurd û jina Kurd ji bo şoreşê çi ne?*

– Bi yek gotinê em dikarin bibêjin; Şoreş bêyî jinê bi ser nakeve, jin jî bêyî şoreşê azad nabe.

Jina Kurd di dîroka Kurdistanê de cara yekemîn e ku di nava civakê de cihê xwe digire. Cara yekemîn e ku li pirsa xwe xwedî derdikeve. Baweriya xwe bi xwe tîne û rûmeta wê çêdibe. Xebatê ji bo gelê xwe dike. Yekîtiya xwe çêkiriye û bi hêz bûye. Ji bo hatina xwe bi cesaret rabûye ser piyan. Ev jî şoreşê pêk aniye. Şoreşa Kurdistanê jina Kurd gihandiye civatê. Riya wê ronahî kiriye û bawerî dayê. Bi vê hizrê îro jina Kurd ji bo hatina xwe ji şerê gerîla bigirin heta bi milîsiyê, ji xebatên siyasî heta çalakiyên dîplomasiyê bi xurtî dike. Ji bo şoreşê û ji bo azadiya xwe vî karî dike. Jin şoreşê bi pêş ve dibe û şoreş jinê bi pêş ve dibe. Herdu hev û din bi pêş ve dibin. Yek bêyî yekê nabe. Jin hêza xwe ji şoreşê digire û şoreşê bi hêz dike. Dûrketina jina Kurd ji şoreşê mirina wê ye. Serkeftina wê jî bi şoreşê ye. Şoreş bindest, ketî û stûxwaran bilind û serfiraz dike. Ji bo vê jî berî her kesî şoreş ji bo jinên Kurd derman e. Şoreş bilindbûn, mezinahî û rûmeta jina Kurd e.

*Ji bo dema pêş çi plan û armancên "YJWK"ê hene?*

– Planên me gelekî fireh e. Em parçeyek ji şoreşê ne. Di nava şoreşê de em cih digirin û xwe berpirsiyarê wê dibînin. Ji bo vê bê çiqasî barê şoreşê giran e, yê me jî ewqasî giran e. Çiqasî plan û programên şoreşê fireh in, yên me jî ewqasî fireh in. Me delameteke wiha daye ser milên xwe, em dixwazin jineke Kurd li derveyî tevgera me nemîne. Nezan û di tariyê de nemîne. Armanca me ew e ku em hemû jinên Kurdan, li ku derê bibin bila bibin tevî têkoşîn û tevgerê bikin û yekîtiya wan çêbikin. Ew yekîtiya wan ji hêlekê wan hişyar, zana û bi hêz bike, ji hêla din ve jî quwetê dide şoreşê.


Kongreya jinên Kurdistanê çêbû. Li ser vê bingehê emê di dema pêş de konferansekê jî çêbikin. Ev konferans dê di meha Adara 1994'an de li dar bikeve. Armancên me mezin in. Em dixwazin beriya her tiştî fikir û ramana xwe ji bo azadiya jinan bînin zimên. Ne tenê ji bo jinên Kurdistanê, lê ji bo hemû jinên cîhanê. Di vê konferansê de emê ji her neteweyan jinan kom bikin. Bi hev re emê li ser pirsa jinan rawestin. Dibe ku navê "YJWK"ê jî bê guhertin. Gelek biryarên nû wê bên standin. Em bawer in ku gav bi gav û bi hêza şoreşê emê van armancan pêk bînin.

*Tu bang û mesajên we yên din hene?*

– Îro şoreşa Kurdistanê gelê me ji heft salî heta bi heftê salî hişyar kirine. Her girseyên gel li şoreşê xwedî derdikevin. Derî xayîn û xwefiroşan her kesê Kurd serî hildaye. Lê tiştên taybetî û xas jî hene. Banga min ji bo jinên xwendevan e, xwedî li rolên xwe derkevin! Jinên ku pêşengiya serhildanan li Cizîrê kirin û dikin, ne xwendevan û ronakbîr bûn. Lê ji xwendevanan bilindtir in. Ev jî rastiya şoreşê ye. Lê karîn û derfetên xwendevanan hene û bi taybetî ji bo "Jina Serbilind". Şerê îro ne tenê bi çekan e. Erê jiyana me şer û çekên me ye. Lê yên ku vî çekî bi hêz dikin, bi hezaran rengê xebatê hene. Yek ji van jî xwendin û nivîsandin e. Bingeha şoreşa me jî li ser vê çêbûye. Li hêla din barê jina Kurd li Kurdistanê gelekî giran e. Zilma rojê bûye jiyana wê. Kuştin, talankirin û şewitandin her roj e. Lê rewşa jinên Kurd li Ewrûpayê hîn nexweştir e. Zilma ber çav li ser wan nîn e. Lê zora li ser wan du qat e. Li şoreşê xwedî derkevin! Bila zilm û zor we netirsîne û we ji nirxên we dûr nexîne.

Em jinên Kurd hîn bêhtir li kar û xebatê xwedî derkevin. Heta dawiyê hişyar bin, zana bin û yekîtiyê çêbikin. Kî çi bibêje bila bibêje, "Serxwebûn û Azadî" paya gelê Kurdistanê ye.

***Hevpeyvîn: Selîm Biçûk***




■ *Li cihê ku mirovahî tê kuştin gul û beybûnan bi xwîna xwe dibişkivîne. Yek jî zarok, jin, kal û ciwanan dikuje. Çiya, deşt, gund û bajaran dişewitîne. Jiyanê bi tevahî dike ber fermana mirina reş. Mirovan û mirovahiyê dikuje. Paşayê mirinê ye. Ê yekemîn terorîst û duyemîn jî mirov û demokrat e (!..) Belê, panzerên paşayên mirinê zarokên bê guneh di bin zincîrên xwe de diperçiqînin. Firokên wan gund, çiya û deştan dişewitînin. Jehra wan jiyanê ji ser rûyê erdê diqelîne. Lê bi hêza zagonên demokrasiyê mafdar û demokrat in (!)*

**Selîm Biçûk**

Mirovahiya hemdem!

Gelo, pîvanên te çi ne? Çawa mirov dibe mirov? Çi cudahî di navbera mirovan û hovan de hene? Bizdan (teror) çi ye? Bizdanvan (terorîst) kî ye?

Yek bi mirina xwe jiyanê ji bo milyonan diafirîne. Nirx û bihayên jiyanê diparêze. Li hember zilm û zorê serî hildide. Li cihê ku mirovahî tê kuştin gul û beybûnan bi xwîna xwe dibişkivîne. Yek jî zarok, jin, kal û ciwanan dikuje. Çiya, deşt, gund û bajaran dişewitîne. Jiyanê bi tevahî dike ber fermana mirina reş. Mirovan û mirovahiyê dikuje. Paşayê mirinê ye. Ê yekemîn terorîst û duyemîn jî mirov û demokrat e (!..) Belê, panzerên paşayên mirinê zarokên bê guneh di bin zincîrên xwe de diperçiqînin. Firokên wan gund, çiya û deştan dişewitînin. Jehra wan jiyanê ji ser rûyê erdê diqelîne. Lê bi hêza zagonên demokrasiyê mafdar û demokrat in (!) Helbet, wê demokrat bin. Ma ne paşayên mirinê ev zagon danîne?! Lê li hêla din çil milyon mirov bi jin, zarok, xort û kalan ve terorîst in. Ji ber ku ji bo mirinê dibêjin: Na. Ji bo qirkirin û talankirinê dibêjin: Na.

Ma êdî ewqas jî dibe ku dinya kerr û kor û lal be!

Belê, firoşvanên jehrê, paşayên mirinê mafdar in, eger gêsinê çavê xwe nebînin. Lê hemwelatiyên wan çi dibêjin? Careke tenê be jî, ji xwe pirsîne ka çi li Kurdistanê diqewime. Çend gund bi tanq û topên paşayên wan hatine wêrankirin. Çend mirov û candar bi jehra wan mirine. Rojê çend bêguneh tên kuştin. Çima çil milyon Kurd terorîst in?.. Na, nebûye. Ji ber ku bi ramanên xwe mejî jehr kirine. Mirovahî kuştine û berevajî kirine. Çav kor kirine. Guh kerr kirine. Ziman lal kirine. Paşayên mirinê zagona hovîtiyê bi rêvebirine. Xwediyê tanq, top, firok, jehr, panzer û her navgînên qirkirinê mirov û demokrat e (!) Lê, yê ku ji agirê nava xwe, camekê bi kevirê destê xwe dişkîne terorîst e (!)

Gelo, qêrîna zarokên Kurdistanê ku çiya dihejîne nagihîje guhên berpirsiyarên mirovahî û demokrasiyê (!) Ma bazirganên jehrê nabêjin çi karê jehra me li Kurdistanê heye? Ma nizanin ku çekên wan ne ji bo nêçîrê ne û li welatê me mirinê diafirînin?

Gelê Kurdistanê jî di bin vê hovîtiyê de xwedî li şeref û rûmeta xwe derdikeve. Xwedî li zarok, deşt, çiya, daristan, candar û jîndarên welatê xwe derdikeve. Rûmeta mirovahiyê diparêze. Mirovahiya ku li Kurdistanê tê kuştin diparêze.

Hey mirovahiya hemdem!


Hinekî çav û guhên xwe veke. Zimanê xwe bilivîne. Zagona hovîtiyê baş bipejirîne. Vê şermiyê ji ser xwe rake. Gelê Kurdistanê bi tenê nehêle. Bêdengiya mirinê biçirîne. Dengê xwe bigihîne wan bûkên ciwan. Zarok û zêçên Kurdan di bin zincîrên tanqên paşayên te de, bi tiliyên xwe nîşana serkeftinê çêdikin û dibêjin: Berxwedan jiyan e. Êdî çelîkên Hîtler, lehengên Nagazakî û Hîroşîma nikarin çerxa felekê berevajî vegerînin.

## Trajediya giyotînê

Pênûsê binivîse! Hê xwîna ku dirije germ e, hê zilma ku tê kirin berbiçav e. Pirtûkê rûpelên xwe veşêre ji taritiya paşverûyan da ku tu qala mirovahiyê û şaristaniyê xweş bikî. Ey çavên hertişt dîtî, tu ji me re qala zanistiya ku di destê paşverûyan de bûye jehr û mar bike. Pênûsê dîsa direvime ba te, her tê rizgar bikî jiyana bi rûmet ji zilmên veşartî, ji kêm û elema peyvên lewitî li dergahên şaristaniyê bi şanazî...

Ew bi çol û qeydan kaş kirin anîn
Li ser rûpelê rûçikê wan jiyan derizîn
Dest pê dikir mêhrîcana mirinê
Her wekî tije însan bûn meydan
Li hêviya jêkirina serê girtiyan
bi hezaran kes...
Serdest û serkar cihê xwe digirtin
Bêdengiyek dikete civîna hov
Her giyotîn dara jehrê bû
Kabeya jiyankujiyê bû her giyotîn
Xeml û rewşên kontesan yê cejnê bûn
Gundî hebûn, bajarî hebûn li wir
Nerm nerm digirîn hinek, hêstir dibarandin
Hinek hêviya serîpekandinê bûn
Dara giyotînê çiqas bi heybet bû
Îcadeke nû bû her wekî...
Ji bo torinên xwedî maf
lîstikeke cihêreng bû ev hacet
Dîlana mirinê dest pê dikir
Berjêr dihat kêra giyotînê, ew nefes.
Dimirin ew
yek bi yek, bi zordestiyeke eyan
Kêfxweş dibû civîna hov
Dîrok wiha dibêje
Wisa tîne ziman
Tragedîa giyotînê çi bibêjim ez!..

**M. Zahîr Kayan**



*Li ser cepheya neteweyî nêrînek*

# Riya rizgariya welêt bi cepheyekê mimkûn e

**M. Xarpêtî**

Ji dema Ehmedê Xanî heta niha, pirraniya ronakbîr û pêşengên Kurdan bi awayekî nivîskî li ser mezin û girîngiya yekbûna Kurdan rawestîne û di vî warî de daxwazên xwe anîne zimên. Rexne li civata Kurd a jihevduketî û belavbûyî kirine û dikin. Riya rizgarbûna Kurdan di yekîtiya Kurdan de dîtine. Lê hezar mixabin nikaribûne yekîtiyeke neteweyî çêbikin. Ji 1975'an bi vir ve careke din di nav Kurdan de yekîtiyên siyasî kete rojeva Kurdan. Lê, hezar mixabin, heta îro yekîtiyeke cidî û berdewam çênebû. Ji ber vê yekê jî di nav partî, hêz û komikên Kurdan de sarbûn û dûrketinek çêbû. Heta gelek caran hatin hember hevdu û bûyerên ne baş çêbûn. Ev rewşa han a nexweş zirareke mezin da doza Kurdan a neteweyî. Lê belê, îsal pêşî di navbera PKK û PSK'ê de û pişt re jî di navbera PKK, KDP-Hevgirtin û PRNK'ê de peymaneke hevkariyê pêk hat. Ev partiyên Kurdan qîma xwe bi vê peymanê neanîn û bangî hemû hêzên Bakur kirin. Pişt re pirraniya hêzên Bakur di nav xwe de civiyan û dest bi kar û barên avakirina eniyekê kirin. Li gor agahdariyan niha xebatên eniyê bi awayekî pozîtîv dimeşînin. Li ser temambûnê ye. Program û destûr amade ne. Bi tenê hinek tiştên teknîkî mane.

### TIRSA DEWLETA DAGIRKER

Xebatên eniyê û berhevhatina Kurdan agir û vit-vit xiste laşê dewleta Tirk a dagirker. Ew ji nêzîk ve xebatên eniyê taqîb dikin. Heta ku ji destê wan were, ew nahêlin ku enî bi ser bikeve. Ew dizanin ku yekîtiya Kurdan wekî berê belav bin, ji her seriyekî dengek derbikeve û wan li dij hevdu bidine xebitandin. Jixwe ji dema Osmanî ve heta niha dewleta Tirk tim ev metod bikar aniye. Osmaniyan hêzên Kurdan li hember hevdu bi kar anîne. Mîr, eşîr, mezheb û tarîqatên Kurd li dij hevdu bi kar anîne û bi wê metodê jî bi ser ketine. Ji ber vê yekê jî, mirov ji dijminê hezar salî lome û giliyan nake. Matmayî jî namîne. Madem ku dijmin e, divê bike jî. Lê, tiştê ku mirov matmayî dihêle, lome û gazinan jê dike di vî warî de hinek derdor û kesên Kurd ên siyasî ne. Ew li ser navê Kurd û Kurdistanê polîtîka dikin û di nivîsarên xwe de bi awayekî vekirî dinivîsin ku "Îro avakirina cepheyekê ne rast e." Li gor eqilê xwe, ji vê dîtina xwe re jî hinek sedeman nîşan didin. Li gor dîtina kes û derdorên wiha; "li Kurdistanê her roj, her dem û her saet rewş dikare were guhertin. Wê demê di rojek an jî di saetekê de xelk dikare dev ji PKK'ê berde û were ba wan kes û derdorên ku 15–20 in ku ji Kurdistanê dûr ketine. Niha di dinyayê de sê hêz hene: Amerîka, Îngilîstan û Japonya. Ev her sê dewlet nebin Kurd nikarin bigihîjine heqê xwe. Ev her sê jî PKK'ê terorîst dibînin. Wê çaxê divê mirov bi PKK'ê re cehpeyê çêneke. Heger cephe çêbe, em Kurd hemû dibin terorîst..."

### TEWRA LI HEMBER CEPHEYÊ

Wekî prensîb îro û her dem li dij avakirina cehpeyeke Kurdistanî derketin ne karê Kurdekî welatparêz û demokrat e. Ji Kurdan û ji hemû gelên bindest re cephe pirr pêwist e. Hem jî wekî hewa, nan û avê. Mirov dikare bibêje, "Îro avakirina cepheyekê ne rast e, lê ne bi her kesî re." Ev dibe û normal e, ku mirov bi yên nêzîkê xwe re cepheyê çêbike. Pişt re hema hema di programên hemû partî û hêzên Kurd ên sayisî de cephe heye. Dema mirov bibêje, "Îro avakirina cepheyekê ne rast e" mirov li dijî program û destûra xwe derdikeve. Îro li Kurdistanê seranser şer e, gund û bajar li ber devên top û tanqan de ne, helîkopter û balefirên şer li gund û çiyayên Kurdistanê bi tonan bombe dibarînin. Her roj bi dehan kesên sivîl tên kuştin. Heta li nav bajêr parlamenterên Kurd têne şehîdkirin. Bi milyonan Kurd ji Kurdistanê bi darê zorê bar dikin. Em jî rabin li ser navê Kurd û Kurdayetiyê binivîsin an jî bibêjin, "Îro avakirina cepheyekê ne rast e!"

Ma kengê rast e, eqilmend û rêberê gelê Kurd ê ne terorîst û demokrat (!?)

Ya duyemîn; kesên wiha li benda belavbûn û qedandina PKK ne û ji bo wê yekê jî dibêjin û dinivîsin ku "Li Kurdistanê roj bi roj, heta saet bi saet rewşa siyasî dikare were guhertin. Ji ber vê yekê jî divê mirov cephe ava neke." Yanî nelezînin, rojek an jî saetek PKK dikare têk here û partiya me bêhêz bibe. Wê demê jî, ji xwe cephe ne lazim e."


Ev kesên wiha ji eshebeyan jî derbas kirine. 15 sal in ku di xewn û xeyalên mirinê de ne. Hê jî, jê têr û hişyar nebûne. Ev mejî û mantalîte wiha xwe dide dest ku heger ew di şûna PKK'ê de bûna û hêza wan ji hezarî yekê PKK'ê bûna jî, dê bi tu hêz û kesî re cephe çênekirana. Ev mejî talûke ye. Mejiyekî xerab e, pîrikobûyî û rizî ye.

Ya sêyemîn; di vî mejî û dîtinê de bawerî bi xwe û gelê Kurd tune. Mejiyekî mandeterî (dagirker) ye. Heta ji mandeteriyê jî xerabtir e. Hêviya xwe bi Amerîka, Îngilîstan û Japonyayê ve girê didin û dozê hewaleyê Xwedê dikin.

Ya çaremîn; rexne girtina li PKK'ê ye. Mirov dikare rexne li PKK'ê û hemû partî û hêzên Kurdan ên din bigire. Ev mafekî neteweyî û demokratîk e. Helbet her hêz û kesî çewtî û şaşî kirine. Lê, divê mirov destê xwe bide ser dil û wijdana xwe. Berê derziyê di xwe de û paşî jî şûjinê di xelkê de rabike. Bi xwe bi xwe bifikire, ka min wekî şexs û wekî hêz heta îro çi kiriye? Kêmasî, şaşî û başî û qenciyên xwe bide ba hevdu. Rewşa ku îro tu tê de yî, çi ye? Madem ku min rast kir gelo çima ez ketim vê rewşa nexweşmahceretî ya bê polîtîk? Çima ez bi psîkolojiya şîzofrenî ketime? Heger mirov li defterên kevin bigere û rûpelan vebike, wê demê dibe ku PKK rexne heq bike, yên wekî we ji sedî sed înfazkirinê heq dike. Cihû dema îflas dikin bi defterên kevin dikevin. Lê, em Kurd in, ne Cihû ne.

### MENFEETÊ GEL Û WELÊT

Enî jixwe navê wê li ser e; gelekî fireh e. Dîtin çi dibe bila bibe, divê hemû partî, hêz, komik û kesên welatparêz di nav de cihê xwe bigirin. Her kes di dîtina xwe de divê azad be. Divê Kurd li dij dagirkeran hemû hêz û îmkanên xwe bikin yek. Di şerê rizgarbûn û azadiya welêt de bibin yek parçe. Di vê têkoşînê de komek jî komek û kesek jî kesek e. Ew partî, komik û kesên ku bi xwe û bi cephe nebawer in, divê ji serî de, bi merdî bibêjin, binivîsînin û nekevine nav kar û barên wê. Ez bawer im, dê ji bo wan û cepheyê jî baştir bibe. Hem li hundir û hem li der, hem li gel û hem li dij nabe!




*Ji bo rizgariya Kurdan cepheyeke neteweyî pêwist e.*

## XAÇEPIRS

**Amadekar: Rasto Zîlanî**

**Çeperast:** 1–Serokê Rêxistina Rizgariya Filîstînê 2–Dikandarê gerok/ Ji nû ve xemilandina tiştekî kevin 3–Sewaleke ku pirr hêdî dimeşe û dikare xwe di nav qalikê xwe de veşêre/ Madeyeke ku wek çixarê tê kişandin û mirov ji xwe ve dibe 4–Xelateke navneteweyî ku di warê sînemayê de tê dayîn/ Avakirin 5–Cihê ku tê de ka tê parastin/ Notayek 7– Destek, piştgirî 8–Ezman 9–Awayekî bangkirinê/ Kişandina lêkera bûyînê ji bo cînavka 3. a pirrhejmar di dema niha de 10–Înstrumaneke muzîkê/ Baş, çak

**Serejêr:** 1–Komkirin 2–Hatin, pêşeroj/ Strana dînî 3–Navçeyekê Batmanê/ Bîber (Kêfa Ruhayiyan pirr jê re tê) 4–Yezdanê Evînê/ Şemetok 5–Kurtnivîsa navê rêxistineke nîjadperest a Amerîkî/ Kesê ku fermanan dide 6–Yan/ Kurtenavê ajanseke nûçeyan/ Qiç 7–Gerdûn/ Navê roja ku ji bo misilmana pîroz e 8–Malzemeyekî erebeyan/ Îşaret/ Bi wî, bi wê 9–Çûyîna bi baskan 10–Sebir 11–Tembel, bêxîret 12–Yezdanê Rojê



**BERSIVA XAÇEPIRSA HEFTIYA ÇÛYÎ**

**Çeperast:** 1–Münîr Ceylan 2–Es/ Sî/ Ra/ Das 3–Îm/ Îd/ Şadî 4–Ûrmeşk/ Jarî 5–Stargeh/ Rê 6–Îma/ Na 7–Nek/ Omer 8–Ag 9–Bestekar 10–Îsa/ Ronî

**Serejêr:** 1–Memûzîn/ Bî 2–Üs/ Meqes 3–Îmsak/ Sa 4–Îsmet/ At 5–Rî/ Şanoger 6–Îkram/ Ko 7–Erd/ Ezan 8–Ya/ Jehr/ Rî 9–Şah 10–Adar 11–Nadîr 12–Sî


## KARTA ABONETIYÊ

Ji kerema xwe re ji hejmara ...... pê ve min bikin aboneyê rojnameya Welat

Nav:

Paşnav:

Navnîşan:

**Bedelê abonetiyê razînin:**

**Li derve:** Mazhar Günbat

İş Bankası Cağaloğlu Şub. Şube No: 1095

Döviz tevdiat Hesap No: 3138437

**Li Tirkiyê:** Mazhar Günbat

İş Bankası Cağaloğlu Şub. Şube No: 1095

Hesap No: 0408342

Ji kerema xwe re cihên li jor vala dagirin û tevî kopiyeke pelê razandina bedelê abonetiyê bişînin.

**Navnîşana Welat:** Nuruosmaniye Cad. Atay Apt. No:5 Daire No:14 Cağaloğlu / İstanbul

Tel (Fax) 511 50 07

**Mercên abonetiyê:**

| | Li hundir | Li derve |
|---|---|---|
| 3 meh | 120.000 | 50 DM |
| 6 meh | 240.000 | 100 DM |
| 12 meh | 480.000 | 200 DM |

## Çîrokek ji herêma Serhedê

# Kerê ji xweliyê û pisînga reşşpî



Carek ji caran rehmet li dê û bavên guhdaran. Gundek hebûye. Êdî reşêlek hatine gund. Berf heliyaye. Zarokan bi şivên re pêz rast kirine şevînê. Paşê zarokan lîstik lîstine. Tevan ji Asê re gotine: "Xwelî li seriyê, bêaqilê, heft birayên te hene li serê çiyê. Tu li vir çi dikî?"

Asê direve tê malê û digirî. Ji dayîka xwe re dibêje: "Tuyê min bişînî cem heft birayê min" Diya wê: "Hey hewar, hey ez a sêwî ka ezê te çer bişînim?" Keçik ji diya xwe dixwaze ku wê bişîne. Diya Asê jê re dibêje: "Ezê ji te re, ji xweliyê (axê) kerekî çêbikim. Tuyê jê re çoço bikî heta derê birayê xwe".

Dayîka Asê kerekî ji Asê re çêdike. Asê li kerê xwe siwar dibe û diçe. Bi şev û roj dihere. Wexta tî û birçî dibe, ji kerê xwe peya dibe. Li ser kaniya zelal avê vedixwe. Pêjek, tûrîk, kerengan, berûyan, tilhuşkan, şîlan û hermiyên serê daran dixwe. Li ser hêşinahiyan vedileze û xwe berdide.

Di binê roniya stêrkan de dilorîne. Deng li çiyayê bilind dike. Şevekê dinihêre ku li serê keloşkekî dû zirav zirav hildikişe. Xwe li wî dûyî digire. Bi serê sibehê re xwe digihînê. Xwe di kozikê de vedişêre. Dema ji kerê xwe re dibêje "şooş" dibe xwelî. Mêze dike heft peya ji malê derketin û çûn. Dihere malê. Rewşa malê pê xweş nayê. Nivînan diavêje ser histêr. Malê paqij dike. Dîzê (xwarinê) çêdike.

Dibe êvar, xwe vedişêre. Nêçîrvan têne û ecêpmayî dimînin. Ji birayan yek di hundir de digere. Keçikê dibîne. Bi porê wê digire û jê dipirse: "Tu çi kesî?" Keçik her tiştî ji wan re dibêje. Bi hev şad dibin. Agir dadidin. Nêçîra xwe ya rojê dipêjin û bi ava sar re dixwin û vedixwin.

Êvarê birayê mezin ji Asê re dibêje:

– Xwengê her sibehê ku tu rabûyî, li binê balgiya min binêre, wê mewijek hebe. Tuyê bidî pisînga (pisîka) min. Ji bîr nekî? An ewê li serê te fenan çêbike.

Rojekê keçik nivînan hiltîne, radihêje mewijê û bang li pisîngê dike. Pisîng tune. Digere nagere nabîne. Mewîjê diavêje devê xwe. Pisînga reşşpî tê; dibêje: "Ka mewija min?" Asê: "Min ew xwar."

Pisîng dihere di kulekê de mîzî ser agir dike. Agir vedimire. Asê dihere dîzê çêbike. Mêze dike ku agir di xew re çûye. Rudine û digirî. Nizane wê çer (çawa) agir pêxe. Radibe, derdikeve der û dimeşe. Li serê çiya avahiyekê dibîne. Di here wê derê. Heft keçik têne pêşiyê. Jê re dibêjin: "Tu li van deran li çi digerî? Dayîka me dêwa heft serî ye, ku ew were wê te li hewayê bixwe." Asê: "Ez hatime agir" dibêje. Agir didinê, şeh didinê, sabûnê jî didinê. Ji Asê re wiha dibêjin:

– Diya me ku hat wê bi pey te bikeve. Nêzîkahî li te kir, şeh biavêje. Wê şeh bibe dar û ber, zinar û kelem. Dîsa gava li te nêzîkahî kir, sabûnê biavêje. Wê rê lê bibe şemetok û cemed. Heta wê demê tuyê xwe bigihînî mala xwe.

Asê radibe bi rê dikeve. Dêwa heftserî bi pey wê dikeve. Asê hawê ku jê re gotine dike. Xwe ji dêw xelas dike û xwe diavêje malê.

Dêw tê li derî dixe û wiha dibêje: "Him dikim, gum dikim, heft deriyê hesin hûr dikim. Tiliya xwe dirêj bike, an na ezê te bixwim." Keçik bêçare dimîne û tiliya xwe dirêj dike. Her roj dêw tê û lê wer dike. Asê newêre hedîseyê ji birayê xwe re bibêje.

Birayên Asê dibînin ku xwişka wan her diçe dihele. Paşê ji wan re dibêje. Rojeke heft bira li malê dimînin. Di paşiya derî de çaleke mezin dikolin. Li hêviya dêw disekinin. Dew tê. Asê tiliya xwe dirêj nake. Dêw hêrs dibe. Çawa xwe li derî dixe, tevî derî dikeve çalê. Heft bira bi şûran lê dixin, dikujin.

Heft bira pişt re diherin bi her heft xwengan (xwîşkan) re dizewicin. Bi mirazê (miradê) xwe şad dibin. Çîroka me çû diyaran rehmet li bavê hazir û guhdaran. Xeynî şeytanê kor î ber dîwaran.

***Berhevkar:***
***Jêhat Gimgim***

# Cotkar û rovî

Li gundekî deştê cotkarek hebû. Navê cotkar Mele bû. Roviyekî bi navê Îskender Axa jî hebûye.

Rojekê Mele bi qayîş û carîve (benê çerm) cot dikir. Rovî fêlbaz bûye, çend roj in ku xwarin nedîtiye, çawa çavê wî li qayîş û carîveya Mele ket, xwest ku bi Mele re hevaltiyê bike.

Bala xwe dayê ku rûyê Mele nerm e. Nêzî Mele bû û pê re bû heval û bira. Rovî rojekê ji Mele re dibêje: "Tu her roj qayîş û carîveyê bi xwe re dibî malê, tu bi min bawer bike, wan li vir bihêle, kes newêre ji tirsa min were vî alî."

Mele ji rovî bawer kir, qayîş û carîveya xwe li hêviya rovî hişt û ew çû mala xwe. Serê sibehê Mele çû zeviyê, bala xwe dayê ku qayîş û carîveya wî tune. Mele berê xwe da mala birakê xwe yê rovî, çû cem wî jê re got: "Bira, bira, ji hundir were der, qayîş û carîveya min winda bûne."

Rovî: "Ez tême, mîna talîzoka tev ba me,
Çek û rext di destê min de ne,
Ez heta sibehê qesr û qonaxên xwe dipême,
Ez ne xwedanê dinê me...
Şev e, şev e mîna dêw e
Jarê min dar e, dora te dar e
Şev yek e, diz hezar e
Ez çi zanim kê qayîş û carîveya te birin e".

Cotkar: "Îskender Axa heke qayîş û carîveya min winda bibin, ew xerabiyeke pirr mezin e."

Cotkar zanibû ku, qayîş û carîveya wî di kuna rovî de ne, fikirî ku here malê, tajî û seyê xwe anîn berî rovî dan. Sey û tajî qesr û qonax ji rovî birrîn, rovî dît ku halê wî xerab e.

Rovî got: "Meleyê mêrxas, di dest de misasa çerxê,
Were peya bibe, ji te re ser jêkim kar û berxê,
Bi lez ji te re bînim qayîş û çarîveyê."

Cotkar dîsa baweriya xwe bi wî anî û sey û rovî jê dûr xistin. Rovî dikeve qesr û qonaxê û dibêje: "Mele! Ez rovî me, roviyekî zerî me, Serê boça (dûvê) min spî ye, bi Mele keniyame."

Cotkar: " Ez Mele me, Melekî dîn im,
Te bi ilm û fenê ji qesr û qonaxê dertînim.
Pêşiya malan bi kizin e, paşiya malan bi kizine,
Qayîş û carîveya min winda bibin, fediyeke pirr mezin e."

Rovî: "Kî ji min jî, incex tu jî rahêle serê boçika min jî
Pêşiya malan bi tûk e, paşiya malan bi tûk e,
Tu ji xwe û ga bitirse ev hîn ya biçûk e."

Rovî dîsa bi cotkar keniya û Mele berê xwe da malê. Kera wî hat pêşiyê got: "Mele, mele! Tu bi vî aqilî nikarî rovî bixapînî. Tu êvarê zikê min bi ceh têr bike, cih û palana min li ser min deyne, bi berdestê sibehê re min berde.

Mele, bi ya kerê kir, sibê rabû kera xwe berda. Kerê berê xwe da qesr û qonaxa rovî, çû li ber deriyê qesrê, xwe dirêj kir.

Bermaliya rovî, bi navê xwe malvîsk serê sibehê derket derve, li ber derî girek goşt bala wê kişand, vegeriya, çû li ba Îskender Axa got: "Kuro rabe min xewnek dît."

Îskender Axa ji xew rabû, got: "Xewna te bi xêr be, ka bibêje te çi dît?"

Malvîskê: "Min dît ku girek goşt li ber dêrî ye. Rovî bi lez rabû, derket derve, nihêrî ku, girek goşt li ber dêrî ye. Vegeriya hundir, deng da bermaliya xwe:

"Serbimastê, serbimastê
Xewnên mala bavê te rast in."

Rovî dixwaze ku kerê bikişîne hundir ji bo xwarinê, dike nake nikare kerê bikişîne hundir. Jinikê jê re got: "Merik tu nikarî bi vî awayî bikişînî, qayîş û carîveya Mele bîne bi lingê kerê ve girê bide, alîyekî jî biavêje stûyê xwe, bikişîne hundir." Rovî bi ya wê dike. Ker ji nişka ve radibe, direve, rovî li dû kaş dibe.

Malvîsk li dû gazî dike:
"Belî bano ha belîbano,
Lingên xwe biavêje paş tûmano
Kerê boz tu birî nav malano!"

Rovî "Mala min şewitiye,
Erdê rast e, serê qut lê dilîze
Ez nikarim lingên xwe biavêjim paştûmane."

Mele bala xwe dayê ku kerê rovî aniye, mele rovî digire û diavêje zîndanê. Bang li cotkaran dike.

Astê mastê, çil cotkar bi misas tê
Postê rovî digurin diavêjin rastê.

Rovî berdidin û tajî didin pey. Rovî xwe zorê ji tajî xelas dike tê mal. Malvîsk li hêviya rovî ye, dît ku kurdiksorek hat, jê pirsî: "Lo kurdiksoro, mêrê min di wî alî de hat, te nedît?

Kurdiksor bersiv da:
Serbidewê, serbidewê
Xewnên mala bavê te giş derew in.
Şevê xewna girê goşt bibîne,
Sibê jî bi kurdiksor xebera bişîne."

Piştî van gotinan rovî çû li quncikekî, can da.

***E. Gundî / Semsûr***

**Ferhengok:**
**Gurandin:** Çerm jê kirin
**Talîzok:** Bablîsok
**Misas:** Ambûrê gîsinpaqijkirinê
**Carîve:** Bendê ji çerm,


### *Xortên Başûr ên li Stenbolê bi hêviya çûna Ewrûpayê di kêferatê de ne:*

# 'Azadî xweş e lê ew çend jî nan pêwist e'

*Em vê hefteyê dawî li hevpeyvînên bi Kurdên Başûr ên li Stenbolê dixebitin re tînin. Bi van hevpeyvînan, me xwest ku em bala xwendevanên xwe bikişînin ser rewşa Kurdên ji bêmecalî koçberî Stenbolê bûne. Me li ser şertên wan ên ku tê de dijîn ji wan gelek tişt pirsîn û ji wan xwest ku rewşa Kurdistana Başûr bi ya Tirkiyeyê re muqayese bikin. Wekî din em li ser sebebên koçberiya wan sekinîn. Gelo Kurd wê kengê ji koçberiyê xelas bibin. Di dîrokê de Kurd her tim ji ber zilm û zora dijmin û hevkarên wan, koçî welatên din kirine. Gelo di welatekî azad de jî mirov mecbûrî koçê dibe? Wekî ku Duhok, Zaxo, Silêmaniye, Hewlêr û hwd. êdî azad in çima hê jî Kurd, nexasim jî pêşmergeyên doh, dev ji wan parçeyên azad berdidin û direvin diçin Tirkiye û Ewrûpayê. Sebebê vê yekê tenê şertên aborî ne?*

*Li ser sebebên vê pirsgirêkê me ji wan pirsî û bersivên balkêş ji wan guhdarî kirin. Em nirxandina gotinên van pêşmergeyên doh û çilekeşên îro ji xwendevanên xwe re dihêlin.*

*Ez dixwazim ku rewşa niha, wek rewşeke taybetî bê nirxandin. Va ye hevalekî min, ku ji zû ve çûye Ewrûpayê xebitiye, dewlemend bûye, berî bi çendekî nameyek ji min re şandibû, di nameyê de hevalê min wiha digot: "Min zanibûya ku Sedamê dîktator wê qebûl bike, çiqas mal û milkê min heye minê tev bidaya, tenê ku bihişta ez bêproblem li bajarê Kerkûkê ji nû ve niştecih bibim"*





*Keko navê we çi ye?*

– Navê min Rêber e.

*Li gorî agahiyên ku hevalên we didan, we Stenbol çawa texmîn dikir û we niha çawa dît?*

– Min texmîn dikir ku gotinên hevalên ji Tirkiyeyê hatibûn (bi giştî) ne rast in, lê bi rastî jî min nizanibû ku hewçend xerab e.

*Hûn jî, ji bo çûyîna Ewrûpayê hatin vir?*

– Na wile. Armanca min ew bû ku, çend mehan li vir bixebitim, hinek pere kar bikim û dagerim Başûr.

*Hûn ji zû ve li vir in?*

– Ev sê meh in.

*We pere kar kir ji bo vegera Başûr?*

– Jixwe em mehê bi du milyonî dixebitin, mirov nanê ziwa bixwe dîsa mehê du milyon diçe. Di nav sê mehan de, vê mehê bêdeyn im, ew jî ez meaşê xwe bistînim dizivirim Kurdistanê.

*Mirovên Tirk çawan in, yên ku hûn wan nas dikin?*

– Wek wehşan in. Bi çavên însên li mirov nanêrin.

*Tev?*

– Ên min nas kirin tev wisa bûn. Gidî em ji welatekî hatine welatekî din û me sedemê hatina xwe ya Tirkiyeyê jî, ji wan re gotiye, hê jî niheqiyê li me dikin.

*Çawa? Pereyên we dixwin?*

– Ez li fabrîqeyekî dixebitim, yekî Tirk ku wekî min jî ji kar fêm nake, meaşê wî çar milyon e, yê min du milyon e. Dizanin ku em mecbûr in bixebitin. Xwedê ji wan re nehêle. Xwediyê karê min nimêj dike û li ser misilmaniyê xwe dikuje. Li aliyê din jî heqê min dixwe. Ev misilmaniyeke çi teba ye hûn bibêjin!

*Li Stenbolê nêzîkbûna Kurdên Bakur li hember we çawa ye?*

– Ez Kurdên Bakur zêde nas nakim. Bes rojekê li ser kar ez pirr qehirîbûm, qîre-qîra patron bû li ser serê min. Ez jî difikirîm, ka em çawa ketin vê rewşa xerab û gunehê min bi min dihat. Wexta xwarinê bû, du xort hatin cem min û zanibûn ku ez Kurd im, ji min re gotin: "Were em xwarinê bi hev re bixwin." Em çûn xwaringehê, me xwarin bi hev re xwar. Paşiyê min pirsî ku ji kîjan bajarî ne, gotin: "Em ji Amedê ne." Ev yek zehf li xweşa min çû û kêfa min anî ku Kurd li Stenbolê jî li hev xwedî dertên.

*Navê we çi ye?*

–Navê min Şemal Sebrî ye.

*Te jî pêşmergetî kiriye?*

– Belê. Heşt salî di nava refên YNK'ê de li serê çiyan, li hemberî dijmin min şer kiriye.

*Hûn çawa dibînin koçberiya ji Başûr?*

– Ez dixwazim ku rewşa niha, wek rewşeke taybetî bê nirxandin. Va ye hevalekî min, ku ji zû ve çûye Ewrûpayê xebitiye, dewlemend bûye, berî bi çendekî nameyek ji min re şandibû. Di nameyê de hevalê min wiha digot:" Min zanibûya ku Sedamê dîktator wê qebûl bike, çiqas mal û milkê min heye minê tev bidaya, tenê ku bihişta ez bêproblem li bajarê Kerkûkê ji nû ve niştecih bibim." Em di vê zanînê de ne ku em herin Ewrûpayê, çiqas li wir bimînin jî, emê poşman bibin, lê rewşa aborî niha me mecbûr dike. Em çawa bikin?

*Ji bo we ziman nabe problem, hûn bi Tirkî dizanin, an jî fêr bûne?*

– Na wile em nizanin. Ziman dibe problem, hem jî problemeke mezin. Baş e ku em bi îşaretan ji hev fêm dikin. Li ser kar wek ku em lal bin. Ne em bi zimanê wan zanin, ne jî ew bi zimanê me zanin, zor e.

*Li vir îdareya we dibe?*

– Bi malbata min re tu problemên min tun in. Ne ew alîkariya min dikin, ne jî alîkariyê ji min dixwazin. Armanca min çûyîna Ewrûpayê bû. Ji bo ku ez dibistana xwe kuta (temam) bikim. Ezê herim jî. Bi çi awayî ez bikar bim ezê herim û dibistana xwe kuta bikim. Û ji Ewrûpiyan re bibêjim: "Va ye bi vî halî û bi hewçend zehmetî dixwînim...

*Pismam navê we çi ye?*

– Arî Elî ye.

*Hûn çend salî ne?*

– 34 salî me. Bêzewac im, ev sê meh in li Stenbolê me.

*Patronê we jî Tirk e?*

– Erê Tirk e. Bira ev Tirk çima wisa ne? Qet bi zimanekê din nizanin wek ehmeqan in. Çanda wan tune ye. Lê mixabin em jî hatine koletiya wan dikin. Ev zehf li zora min diçe.

*Hûnê sedemê hatina xwe ya Stenbolê bi çi ve girê bidin?*

– Vêga hevalên din tev ji bajarên Kurdistana rizgarbûyî ne. Ez û ev hevalên han ji bajarê Kerkûkê ne, ku hê jî rizgar nebûye û di destê Sedam de ye. Li Kerkûkê îro mayîn tê wateya mirinê. Înca ku mirov hinek jî siyasî be û berê jî li hember Seddam be, qet mafê jiyanê li wir tune ye...

*Navê we?*

– Bextiyar e.

*Sedemê hatina we çi ye Keko?*

– Ez wek hevalê Arî jî got, ji Kerkûkê me û ji ber rewşa aborî li vir im.

*Hûn jî, ji bo çûyîna Ewrûpayê li vir in?*

(Jiyan– Kirmanc Abdulwehîd mêr û jinê hev in)

– Belê keko.

*Ji bo çi ye hewçend Kurd ji Kurdistanê dertên û dixwazin derbasî Ewrûpayê bibin?*

–Em bi xwe ji bo jiyaneke bêproblem û xweş dixwazin herin Ewrûpayê

*Qey ev şert li Ewrûpayê mumkûn e?*

– Çawa tê gotin, erê mumkûn e. Mafê jiyanê li wir hene. Hevalên ku çûne Ewrûpayê giş dewlemend bûne, jiyana wan bêproblem e.

*Hûn jî çav li wan dikin?*

– Vêga ez zanim hûnê vê jî bipirsin ku, "Wê rewşa Başûr çawa bibe." Keko çiqas azadî lazim e hewçend jî nan pêwist e. Wextê ku yek kêm be, jiyan nameşe. Niha li Başûr, erê em rizgar in, lê problema aborî me mecbûrî revê dike, yanî ji herdu xalan yek kêm dibe. Ev yek jî heye ku Başûrî diçin Ewrûpayê ji bo gelê xwe dixebitin.

*Xwişka Jiyan tu çawa difikirî?*

– Ez çi bibêjim, ji xwe Kirmanc (mêrê wê) got, emê bi hev re herin Ewrûpayê. Me bi hev re biryara çûyînê daye. Ez jî wek wî difikirim...

*Naxwazin tiştekî din bibêjin?*

– Na, na...

**Hevpeyvîn: Salîh Günbat û Pismam**

welat

• Li ser navê İMC Basın-Yayın Ltd. Şti. (adına) Xwedî (Sahibi) Zübeyir Aydar
• Berpirsiyarê Nivîsaran (Yazı İşleri Müdürü) Mazhar Günbat
• Navnîşan (Adres) Nuruosmaniye Cad. Atay Apt. No:5 Daire No:14 Cağaloğlu / İstanbul • Tel (fax) 511 50 07
• Nûneriya Ewrûpa (Avrupa Temsilciliği) Amed Tîgrîs
• Navnîşan (Adres) Drakenbergsg. 63, NB. 117 41 Stockholm / Sweden • Tel (0046) 884 01 25 • Fax (0046) 884 96 35
• Çapkirin (Baskı) Yeni Asya Matbaacılık